

## Li dûrî qadan 1'ê Gulanê

# Qurban haya me ji Marks nîn e!

Rûpel - 3

**Lêpirsîn:**

Ew ji bo pîrozkirina cejnên  
xwe li benda welatekî ...

R. 8-9

**Nirxandin:**

Ji bo bevalbûna kurdî  
çend pêşniyaz

R. 4

**Vîranîn Zülküf Kışanak:**

Weşîna Mehmet Şenolî  
zewbî xasek bî

R. 6

Azadiya **WELAT**



SAMI TAN

# Aktuelkirina nîrxên neteweyî pêwîst e

**D**i nav gurehiya kar de gelek tişt tîn jibîrkirin û di vî quncikî de ji xwe re cih nabînin. Hefteya çûyî hejmara Azadiya Welat a 116'an derket, bi vî yekê re, rojnameya me li Bakur bû temendirêjtîrîn rojnameya hefteyî ya kurdî. Me dixwest, em vî yekê bi hinek çalakiyan pîroz bikin, li aliyekî gurehiya kar, li aliyê din jî amadehiya çalakiyên sedsaliya rojnamegeriya kurdî rê neda van çalakiyan.

Her wekî xwendavanên me jî dizanin, rojname bi hêsanî negihîşt vî temenî. Îro gelek astengî ji holê hatine rakirin. Têkiliyên bi gel re zêdetir bûne, bi vî yekê re hejmara ku tê firotin jî zêde bûye. Bi xebatê re hate dîtin ku gilî û gazinên ku ji gel tîn kirin, bê bingeh in. Gelê me dema xebateke baş bê kirin, li ser çand û zimanê xwe pejinkar e, digel hemû astengî û tengasiyan li çand û zimanê xwe xwedî derdikeve. Kêmasî di hinek mirovên nîv-xwende de ye, ew jî hest û çanda neteweyî dûr ketine. Em bi zanatî kesên nîv-xwende dibêjin, lewre kesên zana û bîrbir jî li nîrxên xwe yên neteweyî xwedî derdikevin. Bes hinek

kesên ku di bin bandora bîrdoza fermî de mane, hê jî çand û zimanê xwe biçûk dibînin, ji wan direvin. Lê em bi vî yekê kêfxweş û serbilind in ku hejmara kesên bi vî rengî her diçe kêmtir bibe. Doz û armanceke me jî ev e ku kesên bi vî rengî ji binî ve ji holê rabin.

Li ser girîngiya çapemeniyê gelek tişt, hatine gotin. Van rojên hê wê gelek tiştên din jî bîn gotin. Çalakiyên ku ji bo sedsaliya rojnamegeriya kurdî tîn lidarxistin jî didin zanîn ku gelê me bi girîngiya çapemeniya neteweyî hesiyaye. Jixwe ne pêkan e ku bê nehese, lewre digel şerê bi çekan li hemberî gelê me şerekî derûnî jî tê meşandin. Îsal sedsaliya rojnamegeriya kurdî li welêt û li derveyî welêt bi çalakiyên cur bi cur hate pîrozkirin. Hin rojname û kovarên kurdan li ser sedsaliya rojnamegeriya kurdî hejmarên taybet derxistin. Bi boneya vî yekê rojnameya Kurdistan û Miqdad Mîthad Bedirxan jî aliyê gelek kesan ve hatin nasîn.

Jixwe armanca wan çalakiyan jî, digel nasandina wan nîrxan, aktuelkirina ziman, çand û kêşeya kurdî bû. Kesên ku

ew çalakî li dar xistin, xwestin bidin zanîn ku gelê kurd di karê çapemeniyê de jî ne kêmxweza û xêşim e. Dagirker jî vî rastiyê baş dizanin, lewre xebatên çand û hunerî bi qasî xebatên siyasî wan ditirsînin. Hinek şewirker û aqilmendên wan jî niha ve ketine nav tirs û sawa geşedana ziman û çanda kurdî. Bo nimûne, di Samanyolu-TV de Prof. Hasan Köni bi devê xwe got: "Zimanê me nikare xwe li ber zimanê kurdî rabigire. Lewre jî divê em ji niha hin çareyan ji xwe re bibînin." Helwesta hêzên dewletê ya li hemberî çalakiyên pîrozbahiya sedsaliya rojnamegeriya kurdî jî vî rastiyê nîşan didin. Wekî mînak daxuyaniya çapemeniyê ya platforma pîrozbahiyên li Stenbolê ji çapemeniya tirk zêdetir, bala polîsên wan kişand. Her wiha kokteyl û pêşangeha weşanên kurdî ku bi dehan kesî tê de beşdarî kir jî, bala çapemeniya tirk nekîşand. Lewre li gorî wan konjûktûr ne guncaw bû, leşker marjînalîkirina tevgera kurd dixwazin. Lê bi vî awayî ew nikarin rastiyê weşêrin û roj bi bêjîngê nayê weşartin.

Hinek şewirkerên dagirkeran ketine nav tirs û sawa geşedana zimanê kurdî. Di Samanyolu-TV de Prof. Hasan Köni bi devê xwe got: "Zimanê me nikare xwe li ber zimanê kurdî rabigire."

# Ronahiya 1'ê Gulanê li Kurdistanê geş dibe

GIRTÎGEHA BARTINÊ

**K**ed, ji bo mirovahiyê nîrxê herî giranbîha û pîroz e. Ji ber ku mirovahî û civak bi kedê hatine afirandin. Bi hêza kedê, xwe ji rewşa sewalan derxistine. Bi taybetî jî zanîn û ramana mirov bi şixulandina kedê bi pêş ketiye. Lê îro ev pergala paşverû ya kapîtalîst li serê mirovahiyê bûye bela. Ji hêlekê ve keda mirovan wekî qijnikan dimije, li hêla din jî, li ser gelan, hovîtî û dagirkeriya xwe dide meşandin. Li hemberî vî pergala kedxwar, di dîrokê de gelek berxwedan û têkoşinên kedkaran pêk hatine û gelek raperîn hatine lidarxistin. Ji van raperînan karker û kedkaran yek jî di Yekê Gulana 1886'an de li bajarê Chicagoyê rû daye. Karkeran ji bo ku mafên xwe bistînin, li dijî kedxwaran serî rakirin. Li dijî vî serfrakirinê, kedxwaran dest bi qirkirina karkeran kiriye. Ev raperîn her çiqas ku negihabe encameke bi dilê kedkaran jî, ji bo pêşeroja karker û kedkaran cihanê bûye destpêka dîrokeke nû. Ji ber vî yekê ev roj bûye cejneke gerdûnî, ji bo karkeran.

Ev agir e ku bi destê karkeran li bajarê Chicagoyê hatibû pêxistin, îro jî Tevergera Azadiyê li Kurdistanê bi têkoşîna xwe ya şoreşgerî, bi bîrdoza karkeran gur dike. Tevergera Azadiyê di destpêkê de keda mirovahiyê ji xwe re bingeh girt û lê xwedî derket. Bi bîrdoza sosyalîzma zanistî xwe rapê-

ça û bi rengêkî afirîner xwe saz kir. Xelasiya gelê kurd bi sosyalîzma zanistî gengaz dît. Di mercên Kurdistana de nîşan da ku, wê pîrozgîra gelê kurd, bes bi vî bîrdoza karkeran ronahî bibe û wêre çareserkin. Lê tu carî bi sersarî û erzani nêzîkî vî bîrdozê nebû. Xwe tu car di tixûbê Kurdistanê de nehişt, têkoşîna xwe ji bo hemû karkerên cihanê û gelên Rojhilata Navîn bingeh girt. Ji ber vî yekê, ew

şengiya Serokatiyê li Welatê Rojê geş dibe, ji bo hemû karker û gelên Rojhilata Navîn dibe mizgîn û hêviya rizgariyê. Îro keda mirovahiyê li ser vî axa pîroz azad dibe. Li dijî pergala împeryalizmê ya paşverû, ku îro mirovahî bêhêvî û bêmaneviyat hiştiye, Tevergera Azadiyê şerekî pîr-alî û berfireh di-de meşandin. Ev yek jî, ji bo têkoşîna gelan û çîna karkeran, dibe peywira înternasyonalîzmê. Ji ber ku ev pergala ku dixwaze bide afirandin ji bo têkoşîna gelên bindest û karkerên cihanê dibe mîna-keke nû. Îro ev rista ku Tevergera Azadiyê pêk tîne, dewletên împeryalist ji bo pergala xwe mîna xetereyeke mezin dibînin. Ji bo vî yekê jî, di rojname û weşanên xwe de Tevergera Azadiyê wiha dinirxînin: "Dî cihanê de rêxistina terorîst a herî xeternak bi nav dîkin e." Tevergera ku li ser axa Kurdistanê wekî şefeqa

**Di xelesa împeryalizmê de şoreşa ku pêk were, wê ji bo tevayî gelên bindest û karkerên cihanê bibe alîkariya herî mezin. Tevergera Azadiyê 1'ê gulanê careke din jî, dike rihê berxwedanê, têkoşinê û biratiya karker û gelan.**

daxwaz û hêviya şehîdên Chicagoyê û karkeran di têkoşîna xwe de jiyandar dike.

Tevergera Azadiyê di vî meha gulana de gelek şehîd dane. Mîna înternasyonalîstê mezin hevrê Haki Karer û Çar Lawên agir û hwd. Ji ber vî qasê ev meh kiriye meha şehîdan. Ev yek jî wateyeke nû dide 1'ê Gulanê. Tevergera Azadiyê, îro rihê 1'ê Gulanê û yê 18'ê gulana de hevrê girê dide. Ev her du roj, di Kurdistanê de li dijî dagirker û kedxwaran dibin rojên serfrakirin û hesabpîrsînê. Ev ronahiya ku bi pê-

zayîna mirovahiyê bi rolekî wiha girîng rabe, îro taybetiyên vî ristê di avakirina mirovahiya nû û gurkirina şerê şoreşgerî de dide xuyakirin. Şewqa sosyalîzma zanistî li ser axa Welatê Rojê geş dike û roj bi roj tevahiya Rojhilata Navîn ber bi ronahiya sosyalîzmê ve dibe. Di vî xelesa împeryalizmê ya lawaz de şoreşa ku pêk were, wê ji bo tevayî gelên bindest û karkerên cihanê bibe alîkariya herî mezin. Tevergera Azadiyê 1'ê gulana careke din jî, dike rihê berxwedanê, têkoşinê û yê biratiya karker û gelan.

## Ferhengok

- |                                      |                                 |
|--------------------------------------|---------------------------------|
| <b>balinde:</b> teyr                 | <b>keysperest:</b> firsetperest |
| <b>bars:</b> komika                  | <b>kêl:</b> kevîrê ser goran    |
| mêşhungivên derbûyî                  | <b>ligel:</b> digel, tevî,      |
| <b>berjeng:</b> defil                | <b>nesaz:</b> bêserûber         |
| <b>bestêrabûn:</b> îlham-lêrabûn     | <b>neyvik:</b> xew              |
| <b>bêpayan:</b> bêhempa              | <b>nivîgeh:</b> bûro            |
| <b>biyanistan:</b> xerîbî, henderan  | <b>nîgaş:</b> xeyal             |
| <b>bîrdoza fermî:</b> resmî ideolojî | <b>paşav:</b> tirs, xem         |
| <b>bone:</b> munasebet               | <b>pefî:</b> pirtik             |
| <b>çewalner:</b> zordar              | <b>pêngî:</b> pêşwazî           |
| <b>çêdar:</b> tamdar                 | <b>qijnik:</b> qirnî            |
| <b>êrdim:</b> xak, ax                | <b>rabirdû:</b> paşeroj         |
| <b>garte:</b> xîjik, tazûg           | <b>saw:</b> tirs, xof           |
| <b>hêmin:</b> aram (dingin)          | <b>serfrakî:</b> balkêş         |
| <b>hêwîgeh:</b> konklanan yer        | <b>şayesandin:</b> taswîrkirin  |
| <b>hilteqandin:</b> rûçikandin       | <b>şewirker:</b> musteşar       |
| <b>hişmendî:</b> şûr                 | <b>vedeng:</b> olan (yankî)     |
| <b>istol:</b> kûsî                   | <b>vegotin:</b> şîrove kirin    |
| <b>jimar:</b> reqem, nimera          | <b>yeksan:</b> wekhev           |
|                                      | <b>xêlî:</b> hêram (duvak)      |
|                                      | <b>xudewan:</b> tanriça         |
|                                      | <b>zetîre:</b> alav             |
|                                      | <b>zibare:</b> imece            |

Nîmareya faksa me gubertiye.

Nîmareya me ya nû ev e:

0 (212) 251 95 85

## Li dûrî qadan 1'ê Gulanê

## Qurban haya me ji Marks nîn e!

Di yekê gulanê de karker wê dîsa li meydana bin. Her çiqas ev roj bi aliyên xwe yên li meydana derdikeve pêş jî, lê li dûrî qadan rastiyeke din berbiçav dibe. Karkerên ku di mercên herî giran de kar dikin, hay ji vê rojê nîn in. Di gel ku haya van kesan ji yekê gulanê nîn e, gava qala vê rojê dibe çêran dikin. Yên ku qet navê Marks û Lenîn nebi-hîstine gelek in.

Me ji du aliyên ve li yekê gulanê nihêrt. Bi çavên karkerên tirk û bi çavê karkerên kurd, yekê gulanê. Ji bo vê yekê me berê xwe da, taxên li ber gubê bajêr. Em bi karkerên însatan, tekstîlê û karkerên ku sanayîyê re axivîn. Her wiha me ew kesên ku ji însatan dizîya hesinan dikin jî li ser kar, zept kir û pirsên xwe li wan kirin. Dîsa em li dayikeke kurd ku ji sergoyê tiştan ber hev dikir jî rast hatin û me berê pirsên xwe dan wê.

## Em van tiştan nizanin

Di gera xwe de, em pêşî li kalekî Bulgar rast hatin. Kalê me rahîstibû birikeke biçûk û hesinên însaatê jêdikirin. Dema me berê xwe da wî, di serî de tirsîya. Ji ber ku "li ser kar" bû. Lê piştê xwîna wî li ser me keliya û dest bi çirokên dûvedirêj kir. Kalê me yê ku ji Bulgaristanê koçber bûbû, der barê Cejna Yekê Gulanê de kêma agahdar bû. Dema me pirsê xwe navgêrî kalê bi Hüseyn Hoca kir, her çiqas ew jî li Bulgaristanê bû jî, bersiva wî balê. "Em cahil in, bi tiştêkî nizanin. Em bi titûnê re mijûl dibin, ne karker in. Li wan deran cejna karkeran ji aliyê gelek kesan ve tê pîrozkirin. Ew kesên ku dicivin jî piştgiya Rûsyayê dikin. Ew hanî Lenîn me nîn hebûye ji bo wî!"

Rawestgeha ma ya duyemîn tamîrkarekî sarkeran (soğutucu) bû. Ew, ji aliyê Behra Reş bû. Selahattin Uslu, di salên 1974'an de di febrîqeya Ülker de kar kiriye, piştî darbeyê ew ji kar avêtine. Niha ew malnişîn (emekli) e. Selahattin Uslu, li ser Yekê Gulanê wekî teorîsyenar dipêviye, lê belê ji ber ku patronê wî li kêleka wî sekini-bû, zêde neket nav meseleyê. Wî, salên borî û rewşa îro wiha şîrove kir: "Wan deman Sendîqê hebûn. Niha gava ku tu devê xwe vedikiştî te bi serê te de nayînin namîne. Eger gotin di cih de be, îro karker ji bo daxwazên gelekî erzandî derdikevin meydana. Karkerên wê rojê, îro bûne patronên sendîkeyan."



Li rawestgeha sêyemîn jî, em li bal karkerekî ku li "Doğu Sanayi" bi karê torna -tesfiye eleqedar dibû re, rûniştin. Hasan Ekin, ku ji Êlihê (Batman) bû, li ser Yekê Gulanê xwedî hin agahiyên sereser bûn. Haya wî ji Karl Marks û Lenîn nîn e. Li gorî agahiyên wî li "Doğu Sanayiyê" çosa Yekê Gulanê nîn e. Ji ber ku hêzeke

wî bi tenê digot: "Wele bira ez çi bêjime te! Ez nizanîm. Ev heyat ne tu heyat e..."

Hevdîtina me ya li rawestgeha şeşemîn bi dayikeke kurd re bû ku li sergoyê tişt berhev dikirin. Zümrüt Yıldız, pêşîn bi dilgermî em silav kirin. Lê gava me got, em ji rojnameyê kurdî tîn, wê yekcar got: "Lawikê min! Wehî bilehî em ji bo kêfa xwe hatine vê derê. Em gunehê dewletê nexin stûyê xwe. Erê qurban! Em nereviyane."

Cara dawîn, em bi karkerên ku di sektora tekstîlê de kar re dikin, li hev rûniştin. Karkere ciwan ê Sêrtî Kemal Ecer (21) bi politîkbûna xwe bal kişand: "Divê em di cejna karkeran de kar nekin. Divê em wê rojê li meydana bin. Kurd jî dikarin di wê demê de biratiya xwe û yekîtiya xwe bidin." Li aliyê din jî, karkerên kurd ên jin, jî bûn. Ew qehirîn û pirsên me, li me vegehandin. Bes digotin: "Em nizanin, naxwazin bizanibin jî em bi van tiştan re eleqedar nabin."

Her wiha me hin pirs jî li patronê atolyeyê Cemal Ecer kirin. Bersivên wî, rastiya patronan baş didan der. "Bi xwedî! Ez nizanîm bê 1 Mayıs çi ye. Ew jî bo karkeran e, her hal. Marks û Engels nas nakim, naxwazim



nas jî bikim. Jixwe dema Stalîn tê bîra min mejiyê min li hev dikeve. Ferqa Mussolini û Stalîn ji hev nîn e. Ew çûn e. Önemli olan divê em çi bikin. Karkerê tirko xwende ye jî van kesan nas nake. Wê ew karkerê Cûdî çawa nas bike?" Cemal Ecel wekî dawî dibêje ku, "M. Nuri Yılmaz genelgeyêkê ji camiyên gundan re dişîne û dibêje, werin vê hefteyê 'hefteya trafik' ye, em bi hev re pîroz bikin. Ê gundiyan jî erebe nedîtine. Hûn jî wisa hesab bikin."

## Bira weleh nizanîm!

Piştî vê, em li cem Sait Başçı ku ji Erzeromê bû, rûniştin. Gava me pirsê Yekê Gulanê kir, wî, bi tenê qala jiyanê gundan kir: "Wele qurban! Wextê yekê gulanê te gotin, dema hilanîna zandanê bîra min." Di gel ewqas pirsan

nas jî bikim. Jixwe dema Stalîn tê bîra min mejiyê min li hev dikeve. Ferqa Mussolini û Stalîn ji hev nîn e. Ew çûn e. Önemli olan divê em çi bikin. Karkerê tirko xwende ye jî van kesan nas nake. Wê ew karkerê Cûdî çawa nas bike?" Cemal Ecel wekî dawî dibêje ku, "M. Nuri Yılmaz genelgeyêkê ji camiyên gundan re dişîne û dibêje, werin vê hefteyê 'hefteya trafik' ye, em bi hev re pîroz bikin. Ê gundiyan jî erebe nedîtine. Hûn jî wisa hesab bikin."

AZAD ALTUN

## A. Welat, Ö. Halk û kaxezên lîstîkê

Roja 21'ê ji bo ku tîkiliyê di navbera me û karkerên kurd de pêk bîne, em li Aksaray Stenbolê li Navenda Komeleya Xebatkarên Avahiyan (İÇD) bûn. Piştî demeke kin bi biryareke hevpar, em hûn dibin ku wê ji rêveberiya İÇD'yê Xalê Selehedîn wekî rêber. Ji nav çend deveran, cihê ku em herin jî kifş bû: îstîkamet Esenyurt!

Tevî Xalê Selehedîn, bi du karkerên din, em di otobosa Esenyurtê, ku mirov li ser stûyê hev siwar bûne de ne. Bi me re sê çanteyên mezin hene û em li ber deriyê paşîn yê otobosê li ser piyan in. Kî dixwaze peya bibê, di ser çanteyên me de diqewize. Ji ber ku çente rê li ber peyabûna jinikeke digirt, kire xirecir û heta peya bû minamin kir. Çêr li me kirin, dawîya dawî hevalekî me tê de teqîya: "Ez bêm xwarê, ez dê dev û pozê te bipelîxînim" Lê gotina dawî ya jî-nîkê gelek li zora ma û rêwiyan çû: "Kiro!?" Çend rêwiyan lê vegehandin: "Bêterbiye!"

Piştî ku em peya bûn bi qasî nîv saetê jî, embi peyatî çûn, di saet û nîvekê de, em ketin nav sînorên Bahçeşehirê. Li vê deverê bi hezaran avahiyan ne kêmi 10 qatî, bilind dibin. Rêberê me diyar dike ku ji % 80 karkerên vê derê kurd in. Va ye odeya ku karker lê dimînin. Ji bilî kovara Özgür Halk û rojnameyên Azadiya Welat û Ülkede Gündemê, takîma okeyê û kaxezên fantênê (listîk), balê dikişînin ser xwe. Renzeyêke du-tebeq, cil û bergên belavbûyî, li dîwêr çend wêne; Yılmaz Güney, Ferhat Tunç, li raserî wan jî Leyla Zana... Çarçoveya wêneyê Y. Güney ji kabloyên kesk û sor û zer hatiye xemilandin, di teyba xirbende de ka "Grup Yorum".

Piştî demeke kin Çetin Enç, ku ji Erzeromê bû, rûniştin. Çaya me ya zelal li ber me. Piştî 1'ê Gulanê û rewşa karkeran dipêyivîn... Her sê jî ji (Beyrehtar) Karayazîya Erzeromê ne. Temenê wan di navbera 18-22'an de ye. Berê li Sefaköy û li Şarköy a Tekirdağê şixulîne, nêzîkî 10 roj in ku li vir in. Niha nikarin li MED-TV'yê temaşe bikin lê berê temaşe kirine û carna jî çûne HADEP'a Esenyurtê. 5-6 kes di vê odeya teng, ku şibake û deriyên wê ne sazkar in de, dijîn. Hinek hevalên wan li derve ne. Çetin Enç dibêje ku, karkerên Üris û Azerî cînarên wan in, lê navbera wan zêde ne baş e. Wî, ji bo karkerên tirk jî heman tişt got û diyar kir ku, dema karbidestên tirk pê dihesin ku ew kurd in, kar nadin wan.

Me li ser 1'ê Gulanê, meseleyên wan, Mirze Mihemed Çimen, Qada Taksîmê û Marks pirs li wan kirin. Ji bo wan Mirze Mihemed şehîdê rûmetê ye; lê haya wan ji Marks nîn e. Diyar e ku şerm dikin û wiha dibêjin: "Heval îşev li vir be, wê hevalê me Mehmûd gelmiş be, ew dikare van sorîyan baş cevaplandirmiş bike..." Ji ber ku gotibûn: "Em dê beşdarî şahîya 1'ê Gulanê bibin", bi hêviya hev dîtina li qadê, me xatir ji hev xwest.

SALIHÊ KEVIRBIRI

# Ji bo belavbûna kurdî çend pêşniyaz

Mirov bi rêxistinbûn û civakîbûnê bûye mirov. Ger mirovan di nav xwe de, ji ber mercên objektîf tîkiliyeke rêxistinî saznekira, dê wekî sewalan bimana. Di jiyane de gelek nirx û hêjahî piştî rêxistinbûnê de peyda bûne. Ziman jî yek ji wan nirxan e. Ziman, navgîna tîkîlî û danûstandinê di navbera mirovan de ye. Mirov, bes dikare bi zimên, hest, daxwaz û ramanên xwe der bibe. Heke mirov bi awayekî civakî nejiyana, tu pêwîstiya zimên jî nedima.

Di dîrokê de zimanê neteweyî, digel kapitalîzmê, piştî pêkhatina bazara hevbeş derketiye holê. Piştî ku zimanê neteweyî hatin pê, bi vî re dewletên ku li ser bingeha ziman û çanda neteweyî bi rê hatine xistin, ava bûn.

Dema mirov li dîrokê hûr dibe, xuya dibe ku ji ber tîkoşînê çinayeti û dek û dolapên dagirker û çewşneran, gelek ziman ji navê rabûne angû li ber wînda bûne ne. Dîsa gelek neteweyên ku xwe-diyê wan zimanan in, ji ber ku ji derfetên bisazîbûn û dewletbûnê bêpar mane, zimanê wan wekî zimanê peyivîne maye.

Zimanê kurdî jî yek ji wan zimanên ku, ji vî rewşa navborî para xwe standiye. Bi kurdî, her çiqas bi hezaran sal e, li ser erdnîgariyeke gelekî fireh tî axaftin jî, nebûye zimanê dewletê. Lewre jî nebûye zimanê aborî, siyaset, felsefeyê û hwd. Lê mirov dikare bibêje ku ji sedsala 10. hetanî destpêka sedsala 20. geşedaneşî di warê wêjeya kurdî de heye.

Zimanê kurdî û Tevgera Azadiyê

Piştî Peymana Lozanê, bi taybetî li bakurê welatê zimanê kurdî hate qedexekirin. Li ser çarêkê zimanê kurdî ji belavbûna xwe ji dest da. Di dîrokê de zimanê kurdî jî holê rake, gelek rebazên cur bi cur ceribandin. Bi rengê gelekî tund êrîş bir ser tiştên ku bi kurdî re têkildar in. Lê piştî tîkoşîna Tevgera Azadiyê, ev helwesta dewletê ya tunekirinê jî hêdî hêdî tîk çû û kefenê ku ji bo kurdan hatibû pîvan, çiriya. Di salên 1990'î de, di warê ziman û çanda kurdî de jî geşedan û gurbûnek pêk hat. Gelek kovar û rojnameyên kurdî dest bi weşanê kirin, gelek pirtûkên bi kurdî çap bûn. Ev di nav kurdan de bû egera dîlşadî û rûgeşiyêke bêpayan. Lê dema mirov îro li rewşa kovar, rojname û pirtûkên kurdî dinêre, ger hinekî diltenik û pêjînkâr be, bi rastî jî dilê mirov diêşe. Mirov, bivê nevwê pirsînan arasteyî xwe dike. Sedema vî sersarî û xemsariyê çî ye? Hejmara kurdên Bakur bîst mîlyon e. Çima hejmara xwendevanên kurdî li dora sê-çar hezarî ye. Gelo mirov dikare vî rewşê tenê bi dek û dolabên mêtîngeran ve girêbide?

Ji bo di nav gel de geşbûn û belavbûna zimanê kurdî çend pêşniyaz:

1-Divê di saziyên kurdan de, bi tay-

Ek Gündem her heftê ji bo kurdî qoziyekî û ji bo xaçepirsa kurdî rûpelekê vediqetîne. Lê ev pir kême. Lewre ev weşan, xwe digihîne bi deh hezaran mirovan. Dîsa bi pey agahiyên berpirsên kovara Yaşamda Özgür Kadınê, armanca wan xwe gihandina jina kurd e. Lê piraniya jinên kurd bi tirkî nizanin an jî gelekî kême dizanin.

betî di navçeyên HADEP'ê de, digel gel civîna bîne li darxistin, semîner bîne dayîn. Di civakê de girîngî û rîsta zimên çî ye? (Nemaze ev civak, civakeke bindest be û gelê welatekî mêtîngeh be) bête fêmkirin. Di vî warî de peywir û erka serreke dikeve stûyê saziyên wekî Înstîtuya Kurdî, Azadiya Welat, Jiyana Rewşen, Nûbiharê û hwd.

Jina kurd dibistana surîştî ye

2-Dîsa gelek

kovar û rojnameyên kurdan ên ku bi zimanê kurdî weşanê dikin, hene. Ev kovar û rojname digihîjin ber destê deh hezaran. Divê di van weşanan de, ji bo kurdî bi awayekî dorfirer rûpel werin veqetandin. Her wiha divê li gorî derfetên xwe her xebatkarekî/e saziyên ku tenê bi kurdî re têkildar in, di kovar û rojnameyan de berpirsiyariya rûpelên ku dê ji kurdî re bîne veqetandin hilgirin ser xwe û bi awayekî dorvegerî nivîsên bi kurdî binivîsin an jî amade bikin. Bo nimûne: Kovara Yurtsever Gençlik di vî warî de mîna keke gelekî balkêş e. Li dora heft-heşt meh e ku, di her hejmareke vî kovarê de du an jî sê rûpel ji bo kurdî tîne terxankirin. Tiraja vî kovarê penc-şes hezar e. Ev jî nîşan dide ku her meh bi deh hezaran mirov, bivê nevwê leqayî nivîsên bi kurdî dibin. Di vî kovara ciwanan de, pêşî dersên zimanê kurdî hatin dayîn û niha jî dersên wêjeya kurdî tîne dayîn. Dîsa mirov dikare li vir, li ser paşguha (ek) Ûlkede Gündemê, Ek Gündemê û kovara Özgür Kadınê raweste. Ek Gündem her heftê ji bo

kurdî qoziyekê û ji bo xaçepirsa kurdî rûpelekê vediqetîne. Lê bele ev pir kême. Di Ûlkede Gündemê de mirov dikare bibêje gelek nivîs û gotarên ne serincrakêş û bîkêr hene. Ger li dewsa van nivîsên bi kurdî bîne weşandin dê gelekî kêrhatî be. Lewre ev weşan xwe digihîne bi deh hezaran mirovan. Li ser kovara Yaşamda Özgür Kadınê jî heman tişt rast e. Bi pey gotinên berpirsên vî kovarê, armanca wan xwe gihandina jina

werde kiriye. Jina kurd tîkîzî û resenîya nirxên kurdewarî gelek baş parastiye. Em gişt bi çîrok, metelok û lorikên dayîkên xwe mezin bûne û me giyana zimanê xwe ji dayîkên xwe wergirtiye. Ji ber vî yekê divê em, jina kurd bi destên xwe nehêlinin. Berevajî vî yekê, pêwîst e ku di vî kovarê de bi rengê taybet li ser kurdî bî rawestandî û jinên kurd divê bi riya vî kovarê perwerde bibin.

3-Pêwîst e, her kesekî/e ku li ser ziman û çanda kurdî xwe gihandîye radeya pisporiyê, xwe wekî mamosteyekî sirûştî bibîne. Qurs û semînerên bi kurdî bide, bi gel re pêwendiyên germ û bi rêkûpêk deyne. Li ku dibe bila bibe propagandaya zimanê zikmakî bike û divê tenê di nav çeperên saziya xwe de nemîne.


4-Divê em hewl bidin ku, di kovar û rojnameyên me de zimanekî şahîk û fêsih bîkar anîn. Ji bo ku bêhtir bala gel bixşîne, em giraniyê bidin zargotîna kurdî. Ji ber ku em hîna di destpêkê de ne. Bo nimûne em dikarin di her rojname û kovarên ku bi kurdî weşanê dikin de, bi taybetî ji bo destan, çîrok, metelok, gotinên pêşyan, pêkenok û tiştên kan rûpelinan veqetînin. Dîsa jî jina kurdî ya bidin nivîsên li ser jiyana kurdî li Kurdistanê û şayesandîna (taswîr) wê zaya welêt. Ez bawer im ev dê bêhtir serinca gel rakêşîne. Lewre her kurd tam û çêja jiyana li Kurdistanê dizane. Her kurdekî/e ji dayika xwe li çîrok û destanên kurdî guhdarî kiriye.

5-Di warê weşangeriya kurdî de valahiyeke mezin xwe dide der. Divê weşanxaneyêke ku dê bi tenê pirtûkên kurdî weşîne, di navbera saziyên me de bi rengê hevbeş were avakirin. Ji bo zarokan pirtûkên fêrbûna kurdî bîne çapkirin.

6-Divê di serî MED TV, hemû saziyên me ji bo di nav gel de berfirekkirina xwendin, nivîsandin û axaftina zimanê zikmakî kampanyake mezin bidin destpêkirin.

7-Wê di van rojan de ji bo pîrozbahiya sedsalemîn salvegera rojnamegeriya kurdî di bin banê hin saziyan de hinek çalakî bîne lidarxistin. Ev ji bo me keys û derfeteke mezin e. Pêwîst e, em vî fersendê baş binirxînin. Di vî pêvajoyê de em giraniyê bidin propagandaya zimanê kurdî.

MEMED SERHEDÎ



# Rêzimanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

- Wane 8 -

## Di navdêran de mêjer

Mêjer ew tişt e ku pirjimarî û yekjimarî navdêran nîşan dide. Di zaravayê kurmancî de mêjera navdêran bi alîkariya tewang û veqetandekan diyar dibe. Mêjera navdêran xwerû bi alîkariya lêkeran diyar dibe.

Her wekî berê jî hatibû gotin, parkî-tên ku wekî veqetandek tèn binavkirin, tiştan ji aliyê zayend û mêjerên ve ji yên din cuda dikin. Veqetandekên binavkirî /-a/ û /-ê/ navdêran yekjimar û veqetandeka /-ên/ jî navdêran pirjimar dimînin. Dema em dibêjin "mirovê baş" an jî "mirova baş" mirovek bi tene, tê bira mirov, lê dema yek bibêje, "mirovên baş", tê zanîn ku çêlî pir kesan hatiye kirin. Mirov dikare ji bo ravekirina mijarê çend mînanan bide:

Hevala baş hat (yekjimar, mê, binavkirî)

Hevalê baş hat (yekjimar, nêr, binavkirî)

Hevalên baş hatin (pirjimar, binavkirî)

Veqetandekên binavkirî kesên diyar û nas rave dikin. Dema em dibêjin; "Hevalên baş hatin", tê zanîn ku ew heval ji aliyê kesên ku çêlî wan dikin ve tèn nasîn. Navdêran ku veqetandekên

nebinavkirî digirin, çêlî tiştêkî yan jî kesekî/e nenas dikin.

Mêjera navdêran nebinavkirî bi alîkariya veqetandekên nebinavkirî tê nîmandin. Veqetandekên /-eke/, /ekî/ navdêran yekjimar û veqetandeka /-ine/ navdêran pirjimar nîşan dide. Wekî mînak:

Hevaleke baş hat (yekjimar, mê, nebinavkirî)

Hevalekî baş hat (yekjimar, nêr, nebinavkirî)

Hevaline baş hatin (pirjimar, nebinavkirî)

Ji bilî vê di kurmancî de navdêr dema neyên tewandin an jî veqetandekê negirin, mêjera wan bi alîkariya lêkerê tê zanîn. Navdêran ku pirjimar in qertafên pirjimarîyê digirin, lêkerên yekjimar jî qertafên yekjimarîyê digirin.

Bo nimûne, dema mirov dibêje; "Elî nan xwar" tê zanîn ku Elî nanek xwarîye, lê dema mirov bibêje; "Elî nan xwarin" diyar dibe ku Elî ji yekê zêdetir nan xwarine. Ji bo zelalbûna mijarê mirov dikare çend mînanan bide:

Ehmed(i) sêv xwar. (Mirovekî sêvek xwarîye)

Ehmed(i) sêv xwarin (mirovêkî ji yekê zêdetir sêv xwarine.)

Mêjera navdêran xwerû, heke ew di

nava hevokê de nayên bikaranîn, diyar nabe, ji ber vê yekê jî hin caran astengî derdikevin pêşberî mirov. Di vî warî de zaravayê kirmancî (dimilî) bikêrtir e, lewre di vî zaravayê kurdî de navdêran xwerû bi alîkariya qertafa /-î/ yê tèn pirjimar kirin. Bo nimûne heke em heman hevoka li jor bi kirmancî bibêjin, wiha dibe:

Ehmedî say werd

Ehmedî sayî werdî

## Peywira navdêran

Di nava hevokê de navdêr bi karekî dadikeve ango peywirê digire ser xwe, guherînen ku di wê de çêdibin jî li gorî peywira ku girtiye ser xwe pêk tèn. Di nava hevokê de navdêrek an kirde (kirdar) ye, yan bireser an jî biresera navdêreke din e. Heke mirov bi awayekî din bibêje, yan karê ku tê kirin ji aliyê navdêrê ve tê kirin, yan jî ew kar tê serê wê. Bo nimûne dema em bibêjin "Zozanê sêv xwar" li vê derê du navdêr hene, navdêra serenav "Zozan" û navdêra hevenav "sêv" e. Di hevokê de "Zozan" kirde ye, lewre kar ji aliyê wê ve tê kirin, lê navdêra hevenav "sêv" bireser e, lewre ew kar tê serê wê, yanê tiştê ku tê xwarin sêv e. Di hevoka, "Bavê Elî nan xwar" de "Elî" biresera

navdêreke din e. Ji bo ku mirov di nava hevokê kirde bibîne, divê mirov ji lêkerê pirsra kî/ kê (ji bo kirdeyên tewandî) bipirse, bersiva wê kirdeyê destnîşan dike. Wekî mînak di hevoka "Elî(yî) kevîr avêtin" de em dema bibêjin, "kê kevîr avêt" bersiva wê yekcar kirdeyê dide pêş, ew jî "Elî" ye. Ji bo diyarkirina kirdeya hevoka "Elî nêr (nanî) dixwe" jî divê yek ji lêkerê pirsra "kî nêr dixwe" bipirse, bersiva wê jî dîsa "Elî" ye. Ji bo diyarkirina bireserê (pêveber) mirov divê pirsên "kî" "kê" û "çî" arasteyî lêkerê bike. Dema mirov di hevoka "Zinê av anî" de mirov pirsra "çî" arasteyî lêkera "anî" bike, bersiva wê bireserê ango "av"ê dide dest. Dema di cihê wê bireserê de, mirovek hebe wê demê, pirsra me dibe, "kî", yanê dema hevoka me "Zinê Elî anî" be, pirsra me jî dibe "Zinê kî anî?", her wiha bersiva wê jî dîsa Elî ye. Gava di hevokê de bireser tewandî be wekî, "Zin Zozanê tîne", wê demê pirsra me jî dibe "Zinê kî tîne?" Her wekî tê dîtîn, bersiva wê jî "Zozan" e.

Wekî encam mirov dikare bi çend nimûneyan, dawî li vê mijarê bîne.

Zinê xanî malaşt (Kê çi malaşt?)

Soro firaqan diştû (Kî çi diştû?)

Mazlûm(i) doz bi pêş xist (Kê çi bi pêş xist?)

Gundiyan dar çandin (Kê çi çandin?)

## Şowalyeya Azadiyê: Zekiye Alkan (II)

FAYSAL DAĞLI



**B**elê Agir û Însan. Wan her du tégînan ne li tu derê, lê li Amedê wekî du aliyên jiyane, wekî du seriyên jiyane, bala Zekiye dikişandin: Agir û Însan; Ferhat, Necmî, Eşref û Mahmut. Heşt sal berê. Bi agir sotan. Bi agir, ji çiyayên agir, ji xortên çavagir, ji dijminê zilmkar, ji welatê di navê agir de, jiyane, bi agir... Ev germahiya pîroz, ev sorahiya Newroz, ew ezêba dilsoz.

Roja Newrozê, keçeke dilsoz, bi amanceke pîroz, li Amedê, li paytexta dilan, li Amedê, li serbajarê evîndaran... Li Amedê Newroz, li bajarê dorpêçayî, li bajarê hatiye dagirkirin, li bajarê di nav agir de, agir jî di nav de gerek e, çirîskêk ji nav kelê gerek e. Ji bo Amedê, ji bo Diyarbekira şewitî, careke din bişewite. Ji bo xirabiya di pêşra Amedê de, bi agir bisote, çirîskêk gerek e. Ji bo agir êdî neşewitîne, ji bo ezêba agir biqede, agirek din, agirekî gurtir gerek e. Ji bo çirîskêk, ji bo çirîsk, dilek, dilovanek gerek e. Zekiye difikire, agir difikire, Kawayê Nînowayî difikire, Mazlûmê Amedî difikire... Ji bircên befilandî re alazek, ji serhildanê re îşaret gerek e.

Roja 21 ê adarê. Amed. Taxa Deriyê Ruhayê.

Li bin Birca Heft Birayan. Heft birayên qehreman. Heft parêzkarên Amedê. Heft şowalyeyên ku hevşed sal berê, li dijî dagirkiriyê dijimin, birca kelehê ji xwe û dijminê xwe re kirin goristan. Zekiye li bin diwarên bircê. Di destê rastê de bidona benzîn û tînerê, di destê çepê de, pankartek. Li ser dirûşmeyek; 'Bijî Newroz'. Kolan tijî zarok û jin. Li ser diwarên kelehê polîs û leşkerên nobedar. Zekiye, derfet nabîne ku hilkişe ser bircê. Li ser cadeya li kêleka kelê, li dora xwe benzîne direşîne. Bi benzîne daîreyekê çêdike, pankarta xwe dide destên zarokên ku li wê temaşê dikin. Paşê benzîn û tînerê bi ser xwe de dadike. Û niştikê pêdixe.

Agir... Germahiya pîroz. Zekiye serdanpê di nav agir de. Pêşî guliyên wê yên reş dişewitin, porê wê, cilên wê... Zekiye seranser di nav agir de... Zarok û jin diqîrin. Ber bi wê ve dimeşin. Pêlên agir bilind dibin. Zekiye bêdeng û lebat, li dora xwe dinêre. Tiştêkî nabêje. Zekiye, dişewite, bi agir disoje... Agir diweste, agir dîtefe, afir radiweste, agir di bedenê Zekiye de dibetile. Ji bilî dilê wê û çavên wê yên reş, çavên wê yên du libên yaqûtî, hemû laşê wê şewitiye.

Zekiye radikîna nexweşxaneyê. Di raporlorên polîsan de navekî naskirî, bi xof tê ragihandin: Zekiye Alkan xwe şewitand.

Zekiye. Birîndara jehra asimilasyonê. Zekiye ji Kurdistanê dût, li sirgûnê, li zewiyên biyanî çav dayê dinyayê. Zekiye keça sirgûnê, kulîlka berfê. Berfina welatê jîbîrbûyî. Gula adaran, bûkîka çiyayên Mezopotamyê. Zekiye li nexweşxaneyê ye. Nexweşxaneya ku Zekiye ji bo nexweşan derman belav dikir. Zanîngeha ku Zekiye lê

dixwend, Nexweşxaneya Zanîngeha Dijleyê. Dorpêçayî, dagirkirî, nahêlin kes here ba wê. Li ber deriyê nexweşxaneyê bi sedan hevalên Zekiye... Zekiye li pişt diwarên qedexekirî. Laşê wê ji sedî 90 şewitiye. Ji bo dost û dijminan, heval û xizman bersiva pirsra 'çima' dide: "Agirê Newrozê ne bi qirş û qalan, herf baş bi laşê însanan pê dikeve. Ji bo Newrozê, agirên gur, alazên bilind gerek in. Min bi zanebûn û bi dil, ev çalakî pêk anî. Kes li pey min tiştêkî xelet nebêje." Zekiye radikîna nexweşxaneya Enqereyê. Dilê wê yê zêrîn, heta roja îne, danê nîvro, li ber xwe dide. Ruhê Zekiye, ruhê prensesa agir, ruhê Amalaqa hukumdara Amedê, keçên din dibe. Zekiye, bîranîna û ruhê xwe diyarî keçên Mezopotamyayê dike. Xweliya xwe li ser Çemê Dijleyê, porên xwe li ser çiyayên Andokê, bijangên xwe li ser dilê xortên Amedê direşîne.

Piştî Mazlûm 8 sal derbas bûne. Peşengên wî, li lûtkeyên dora Amedê, li serê Spî û li Andokê ne. Hevalên Mazlûm, tolhildêrên sondxwarî, li ser şopa dîrokê ne. Bajêr dihejin. Ji Amedê dengê dîrokê olan dide êdî. Navê Zekiye, feyz daye şowalyeyan. Kolanên Amedê qadên şer in. Zarokên ku li şewata Zekiye temaşê kirin, niha li çiyane. Di dilên wan de bijangên Zekiye neqîşandî ne. Zekiye bû peyker li Kurdistanê. Peykerêkî ji agir, peykerêkî efsanewî. Zekiye, li Suleymaniyeyê li kêleka Leyla Qasim, bû xudawena cesaret û azadiyê. Piştî Zekiye dawî li efsaneyê nehat. Çîroka agir bidawî nebû. Çirîska wê pêxist, li Mezopotamyayê bû meşale û rîya meşa dîrokê ronî kir.

# Weşîna Mehmet Şenolî zewbî xasek bî

**R**ojnamegerê estbi, nameyê ci Mehmet Şenol bi. Ma piya xeylê xeftiyayî. Amed de, Stenbol de ma piya mendim û zaf çî ravêrnayî. Embazîna rojanê tengîn xeylê zahmetîn o, kes nêşeno winî rew rew verpersê ê rojan bido. Raşt û çewtinê ma piya bî. Ma jew fin dayî pêro û jew fin jî zey di birayan piya xeftiyayî. Wexto ke kes weyneno peyniya xo û weşîna xo ano çimanê xo ver; tayn çîyan ra weş nêmaneno. La belê tayn çî jî, zey astarîkan kesî vero tim û tim akewte maneno. Şenol zaf çimakerde û aqilîn bî. Ey qandê dişmenî wina vatê: "Dişmen qandê ma finê jî rind nêfikriyeno. Ma vajime ke qandê çiyêki diyine xo weş ardo ziwan; winî bizanê ke na diyin bind de xerabîne esto. Dişmenî ra rindiyê pawitin merdinê ma wo."

Mehmet Şenolî Kurdistan de, qandê 2000'e Doğru, Yeni Ülke û Özgür Gündem rojnamegerîn kerd. Nê weşanan ra Özgür Gündem de vêşî xeftiyê û rojnamegerîna xo veraver berd û na rojname de silasniyayê. Wexto ke Özgür Gündem pancas-şeşî hazar rotê, ey Amed, Dêrsim, Elazîz de rojnamegerîn kerdê û her gi roj jew embazê xo winî kerdê. Coka Embaz Şenolî kiştê ra rojnamegerîn kerdê û kiştê ra jî qandê weşîna embazan, zey şervanan xeftiyayê. Jew fin o bi xo kewtê kontrayan dim. Rojê Hasan Özgüniya kewtîbi jew lecê. Ê, Amed de şewra rew rojnameyan wexto ke kenê vila, kontray îna danê gulan ver.

Mehmed Şenol jî ebi dabançaya vejyeno kontrayan ver û kewno lecî. Çi heyf o ke dabança ci nêteqeno, la belê kontray zey kutikan ey ver ra remenê. Ney lecî de Hesên ling ra taynekê bibi dirbetin. Bahdoyê ney lecî polîsan embaz Şenol berdî û eyştî binçim. La balê zaf xo verkewtê, çirê ke dabança nêteqêbi. Wexto ke ma ci rê vatê Şenol, "Qandê çiçî dabança nêteqê ke. Zek vanê, to nêşawo dabança biteqne. Se bi ke?" Nê vateyan ser riyê xo kerdê tîrş û wina vatê: "E embaz ez tersaya. Ez se kera dabança jî kontra bi, bêwayir nêteqê. Verê çend rojan ma ceribnabi jî. Ma jew kontra erodayê, çî weş biyê. La belê nê kutikî nêkewnê ma ver-ke, finê mirazê xo biyarê ca." Tayn embazî estê, vîranîna înan zaf kul û keder dano kesî. Nê embazan ra jew jî Şenol bi.

Kontrayan, polîsan û eskeran nêve radayê ma Kurdistan de rojnameyan



biroşê. Qandê co Kurdistan de ray tepîstê û dest-dayê rojnameyan sero. Dewlet qandê tepîstina rojnameyan des-pançê cayan de tertîbat girotê. Ma her gi roj jew babeta rojnamey berdê û vila kerdê. Xora dûkanan de nêverdayê rojnameyên ma biroşyê. Qeçikan kuçan û mehlan de ebi tiritina rotê. Dewleta tirk se kerdê nêkerdê jî, nêşayê na çerx vindernayê. Sera neway û hîrin bi, rojê min ebi otobosa Diyarbakir Sura Adna ra nojnamey berdê Amed. Xeraj de Mehmet Şenol, Hasan Özgün, Cemal Dağ, Cevahir Yıldırım û çend embazna ez wija de pawitê. Her embazê jew koşe de vinderdbi û çosme çimîn kerdê. İnan xeraj kerdbi bandorê xo bin.

Şenol ke ma resayê xeraj, çahar panç deqan miyan de, embazan zey vergan rojnamey otobos ra ardî war, eyştî taksiyê, wija ra kewtê dûrî. Embaza Cevahir jî, tayn rojnamey girot û ebi jew taksiyêya berd Batman. Ez wija de şaş mendbiya. Ez û embaz Hesên dima amey Bürooy ke, rojnamey vila biyê jî. Şenolî wexto ke çiyê ardê ziwan, zaf xemilnayê. Min no xusetê ci zaneyê, coka ey ra persê vilakerdina rojnaman kerd. Ey no gurwê wina ardîbi ziwan: "Ma şewra rew tertîbatê xo gênê. Polîsê tirkan şenol ke tertîbatê gênê, ma jî winî ê xo gênê. Embazî xo

şan ra kenê hadre û şefaq ra yenê pê sero. Her şêwe cayê de kom benê û karî xo miyan de par kenê ke, çî nêke-wo pê miyan. Bahdo jî yenê xeraj û otobos pawenê. Otobos şenol ke yena xeraj, ma cixarey miyan de rojnameyan gênê û rişenê cayên ke roşyenê. Eke roja polîsî nêşenê rojnameyan ma ra bigîrê, ma a roj veyve kenê embaz." Şenolî wexto ke nê qisey ardê ziwan, qirixîna xo dayê dest, çiman ra jî mizûrey vila biyê. Çimke merdimê metropolona zaf weş kuşat kerdê û ci ra kêf girotê.

Dewleta tirk, 10'ê berfanbara 1993'in de roja mafê merdiman de, varda búroyanê ma ser, nezdiyê 150 embazî kewtî binçim. Stenbol de roja bîn nezdiyê 100 embazî viradayayî. Mehmet Şenol a vardayin de nêtepişyêbi. O Enqere ra roja bîn amê Stenbol. Ez, Şenol û embaz Bâhoz, ma amey pê ser û kombiyayinê viraştî. Na kombiyayin de, ma Mehmet Şenol ard rojnamey ser. A roj tayn merdimî werte ra winî bî û tayn merdimî jî rojnamey rê wayir nêvejiyayê. La belê kes nêşeno rewşenbir Hâluk Gergerî, Ertuğrul Kürkçüylî, Ragıp Zarakolî, parêzger Hasan Giritliyî ewtiyad xo virkîno.

Rojnameya Özgür Gündem, nezdiyê pancês rojî serokatêya

Mehmet Şenolî de çapbî. Tayn kemaneyê embazî bibo jî, ebi rûmeta ma ê rojî ravêrnayî. Şew roj, ma pancês rojî rojnameyî de piya ravêrnayî. Roja sifte şan, xeber çapxaneyî ra amê ke rojname bêproblem vila biyo. A şew Şenol winî kêfweş bibî ke embazan rê wina vatbî: "Ney ra tepya top ma ro kewo jî, ver mekewê. Çimke dişmen sereyê xo ser guna war ro, çimke Özgür Gündem fina kewt ray. Ma ewro terso gird visna zerya dişmenî ra. Na roj dîrokî ya. Embazan ewro dîrok nûsnê. A bîn jî dişmeno, rind bimûso ke no şaro ney ra tepiya çewt nêkewo. Raşt o, embazî zere de yê, la belê waştananê înan amewo ca, wa kes xo nêtewno. Çimke ma ney lecî de ebi ser kewtî. Na roja weş û ebi rûmet ma hemînan rê pîroz bo."

Mehmet Şenol çend mengî tepiya, rojnamey ra abiryê û şî Kurdistan, wija ra şî koyan û tewrdê gerîlay bi. Çi heyf o ke gerîlay miyan de vêşî nêmend û ebi new embaz û Doxtor Orhan Ersözîya Qulp de şehîd kewt. Malbata ci se kerd nêkerd, dewlet ra meyitê ci nêşa bigirotê. Şenol, zey waştina xo şehîd kewt. Ez bawer a ke, çimanê ey akêrdê nêmend. Ma yê to xo vir nêkerê Şenol!

ZÜLKÜF KIŞANAK

□ 30 Avrêl 1975:

**Wietnamê serxwebûna xwe ragihand**

Hêzên Şoresşger ên Wietnamê, paytexta Wietnama Başûr Saygon (peyre bû Ho Şih Mînh) bi dest xist. Piştî berxwedaneke dûvedirêj, li dijî hêzên dagirker ên Amerîkî, hêzên Wietkong ku bi rêberiya Partiya Karkeran a Wietnamê şer dikirin, perçeyê başûrê welat rizgar kirin û gihîştin serxwebûna xwe. Di vî şerî de 3 milyon û 500 hezar kesî canê xwe ji dest da.



1 Gulan 1977:

**Qetliama Taksimê**

Di pîrozbahîya Cejna Karkeran a sala 1977'an de, li Meydana Taksîma Stenbolê, ku piştê ji hêla derdorên azadîxwaz û şoresşger ve wekî 'Meydana 1'ê Gulanê' hate binavkirin, hêzên kontrayî êrîş birin ser 500 hezar kedkarên ku cejna xwe pîroz dikirin. Di vê gulebaranê de 37 kedkar hatin kuştin, bi sedan kes jî li hev qelibîn, perçiqîn û birîndar bûn.

# Pîrozbahîya 100 salîya Rojnamegeriya Kurdistanê

Xebatkarên nivîsgeha Rojnameya Ûlkede Gûndemê ya Îzmîrê roja 21'ê Avrêlê, ji bo pîrozbahîya sedsalîya Rojnameya Kurdistanê, li Navenda Çanda Mezopotamya kokteylêk li dar xist.

Di pîrozbahîya ku bi beşdariya 700 kesî pêk hat de, gelek rewşenbîr û kesên navdar jî cih girtin. Di nav van kesan de, li ser navê DEHAP'ê Veysi Aydın, Sekreterê Navenda HADEP'ê ya Îzmîrê Hayri Ateş, Sekreterê Giştî yê KESK'ê Faysal Özçift, Nivîskar Veysel Çamlıbel, endamên kargerîya ÖDP'ê yê Îzmîrê, xebatkarên NÇM'ê, Azadiya Welat, Özgür Halk, Komal, Hêvî û gelek parêzer hebûn.

Kokteylê, bi rawestîna rêzgirtinê ya ji bo şehîdên şoresşê û çapemeniyê dest pê kir. Piştê hin rûpelên rojnameyên kurd bi makîneya slaytê hatin nîşandan. Kolteyl, ji aliyê nûçegihanê Ûlkede Gûndemê Derya Bektaş û Yüksel Aslan ve hate pêşkêşkirin.

Dayika Rahşan Demirel, ku di Newroza 1994'an de agir berdabû canê xwe, Emine Demirel jî di kokteylê de axaftinek kir. Wê, bang li dayikê leşker û polîsan kir û got, zarokên xwe neşînin leşkeriyê. Emine Demirel her wiha bang li rayedarên Tirkiyeyê jî kir û di dirêjiya axaftina xwe de wiha axivî: "Banga min ji dijmin re ye. Hûn êdî bi kuştin û lêdanê nikarin me red bikin û ji mucadeleyê, me dûr bixin. Werin vê meseleyê bi aştîyê hal bikin." Piştê Emine Demirel bang li kurdan kir û da zanîn ku, hewce ye kurd êdî bibin yek, ji ber ku azadiya kurdan nêzîk e.



**Mahmut Döken**

Di salvegera çûyîna te de em te bi bîr tînin û bejna xwe careke din li hemberî te ditewînin

Li ser navê malbata wî

**Sîdar Dökmen**



Danerê rojnameya pêşî ya Kurdî Mîqdad Mîthed Bedirxan

# كوردستان

پێشڕۆژێک، یەکێک لە بەرنامەکانی خۆڕاپێڕی کوردستان  
پێشڕۆژێک، یەکێک لە بەرنامەکانی خۆڕاپێڕی کوردستان  
پێشڕۆژێک، یەکێک لە بەرنامەکانی خۆڕاپێڕی کوردستان

**KURDISTAN**

Address: Via de Coroglio, n° 7, GENOVA (Italia)  
خۆڕاپێڕی کوردستان، هەموو ئەوانێک کە بەرنامەکانی خۆڕاپێڕی کوردستان

Piştî vê axaftinê, peyamên Azadiya Welat, Özgür Halk, Weşanxaneya Komal, Rojnameya Hêvî, DMP û Demokrat Radyo hatin xwendin.

Di kokteylê de koma zarokan Dengê Bahoz jî berhemên xwe pêşkêşkirin. Peyre Şanoya Hêvî listîka xwe ya bi navê "Li ser dîroka şerên çinayeti lînerîneke ritûel" pêşkêş kir. Kokteyl bi konsera Hozan Cezmi qediya.

DAVUT ÖZALP/İZMİR

**Hevala**

.....  
Ji dest min çû şepalek  
Ji min dûr bû delalek  
Li min kêr bû hevalek  
Tahl e derdê hevalan

.....  
(Cigerxwîn)

**ÇAVDÊRÎ**



## Serdeşt Helebçeya li pêş Helebçe

MÎRHEM YÎÇÎT

Em çendî xwe nas dikin, ew çendî em dibînin ku, em xwe nas nakin an jî naskirina me kêr e û tîrî me nake. Xelk û welatên cihanê ji sedsalan û vir de, ji bo naskirina xwe di nav xebat û çalakiyên heralî de ne. Xwenasîna wan sistematîk û berdewam e. Ne bi tenê wekî meseleyeke kulturî, dîrokî û sosyolojîk, her wiha bi xweza û sererd û binerda xwe. Bi giş çiya, rûbar deşt û ajalên welatê xwe.

Salên paş heftê û pêncan li Swêdê paxavek hebû, heta ketibû dengûbas û programên televîzyonan. Çi bû ev mitale? Mitale ew bû ku, hejmara guran li Swêdê kêr dibê. Tirsek hebû ku, gur gelekî kêr bûne û ev hejmara ku niha başbaş di bîra min de nemaye, bi rengêkî temam didan.

Belê, hin xelk li welatê xwe hejmara lawir û dirindeyên berfî angoyî jî zanin. Mesele ew çendî total û welatgîr bûye. Em dev ji vê jî berdin, kes, zana û alim hene ku, pîrsa nasîn û naskirina bi welatên xwe ve jî sînor nakin û welat û xelkên din jî dixin nav projeyî xebatên xwe. Em xebatên Darwin, li Amerîkaya Latîni, yê Marko Polo jî Îtalya heta bi Çînê û bi sedan gerok û seyahên din û seferên ezmên û planetên din bi bîr bînin.

Dev ji duh û rabirdûya dûr em berdin, bûyer û qewmînen xwînawî, trajedî û bobelatên malkambax ku berfî vê bi çend salan li welatê me rû dane, em ji bîra dikin, em li ser wan ne xwediyê agahdarî û serwextîyeke bi serûber in.

Şemîya buhurî Înstîtuya Kurdî ya li Stocholmê li ser bombebarankirina bajarên Serdeşt (7/6/1987) li Rojhilata Kurdistanê civînek li dar xist. Ev kîmyebarankirin û karesat berfî Qirkirina Helebçe qewimibû. Tu li eslê wê binêrî, Helebçeya ewil li vir bû. Lê ji ber ku Sedam hinekî ev dirindeyî bi haydariya rêxistinên Rojhilata kiribû, serok û siyasiyên Rojhilata piştî jehrbarandinê û agirbarandinê, ji ber tîkiliyên xwe bi Iraqê re tîstêk negotibûn. Ji xeynî xelkê bajarê Serdeşt, kes bi vê barbariya berfî Helebçeyê bi şeweyekî baş nehesiyabû û mabû heta bi roja Semînerê.

Gava diyar bû ku, li Serdeştê di wan rojan de, piştî êrîşên Sedam li dora 500 kes hatîye kuştin, zêdeyî 700 kes birîndar bûne û ji %80 şênîya Serdeştê jî, ji cih û warên xwe derketiye, giş beşdarê semînerê, ne bi tenê yê ji Bakur, belê yê ji Rojhilata jî di nav man heyîrî.

Li vir pîrsek heye ku, tîkiliya wê bi bîr û hafîza neteweyî jî jiyan bi hişmendî re heye. Hafîza neteweyî qels e û jiyan jî hê li gorî pêwîstî û dereceya tê xwestin ne bi şîr e. Lê tîstê xerabîrî û malkambaxtir ew e ku, hin rêber kor û bêmesûliyet in, li Rojhilata û Başûrê welatê me. Ew bi xwe tawanên dijîman vedîşerî, behs nakin û xwe li ser wan ker dikin.

Belê xelkî mîna ku di semînera Înstîtuya de jî hate dîtin û ji tîro û pê de nema qebûl dike û dê li ser xwe bixeyide. Şoresşa Bakur, ji bo gelê me yê li vî parçeyê welatê jî-dilqewînî û hêzeke ku mirov dikare piştê xwe bide û bawerîya xwe pê bîne ye. Ev di vê semînerê de jî baş hate dîtin û gelê me yê ji Rojhilata, hinekî din nêzîkî Serokayetiya Neteweyî bû. Dîşa xuya bû ku Serokayetiya jî hinekî din çendî dermanê derdê kurdan bûye.

# Di vê 23'ê avrêlê de ji zarokên kurd tune hatin hesabandin

# Ew ji bo pîrozkirin



Cur Zarokên...  
Lê belê wekî gelekî ku herî kêm 40 milyon e, gelê kurd ji vê derfetê bêpar maye û heta niha bi tu caran nehatiye vexwendin. Bi vê helwestê, di cihanê de bi milyonan zarokên roj û agirê tune, tene hesabandin. Li gorî daxuyaniyên rêveberên dewleta tirk, xwe-

Rêveberên NCM'ê serî li balyozxaneyên Amerîka, Spanya, Îngilistan, Germanistan, Swisre, Îran û Îtalya da, da ku wan der barê maf û rewşa zarokên kurd de agahdar bikin. Balyozên wan welatan soz dan ku, ew dê li ser vê mijarê rawestin.

ne divê sîde wergerin.

Em dixwazin ji vê peymanên çend xalan raberî we bikin;

1) Madeya 8'mîn a bendên 1 û 2'yan de wiha ye:

"Dewleta ku ev peyman îmze kiriye, her wekî di qanûnê de ji hatiye ravekirin, mecbûr e ku, ji bo mafên zarokan ên nasnameyî, hemwelatî, navlêkirin û têkiliyên malbatî, hurmetê nîşan bide û divê bi tu awayî li dijî vê qanûnê tevnege-re."

2) Madeya 30'mîn ;

"Divê zarokên mensûbî hemû hindi-

kahiyên (azînlîk) bikaribin ji nîrxên xwe yê çandî û nasnavî sîde wergerin û bi serbestî bi zîmanê xwe bipeyivîn, ol û baweriya xwe bijîn.

Her wiha 11 madeyên bi vî rengî di peymanê de ji bo mafên zarokan hatine diyarkirin. Dema mirov van madeyan û pratîka dewleta tirk bide berhev, du dîmenên serdanpê dijberî hev derdikevin holê. Em wan xwestekan û zagonên Neteweyî Yekbûyî yê ji bo zarokan bidin aliyekî, îro bi milyonan zarok di şertên herî xirab de, rojê 12-14 saetan bi awayekî kolewarî tîn xebitandin. Zarok, ku

**W**ekî tê zanîn li Tirkiyeyê 23 avrêlê wekî roja zarokên hemû dinyayê tê pîrozkirin. Ji bo rojê, ji aliyê dewleta tirk ve ji gelek welatên cihanê zarokên neteweyên cur bi cur tîn vexwendin û tevî van zarokan, ev roj bi awayekî girseyî li her derê Tirkiyeyê, bi taybetî ji li dibistanan wekî cejneke neteweyî tê pîrozkirin. Ev roj, ji ber ku bi taybetî ji bo zarokan e, rojê watedar û girîng e. Ji ber ku ji gelek welatên cihanê zarok tîn cem hev û bi riya muzîk, govend, listîk û her cure çalakîyên xwe yê hunerî, çanda xwe û zîmanê xwe didine nasîn, bi vî rengî têkiliyên xurt di navbera zarokan de çêdibin. Tiştên bi vî rengî bêguman erênî ne û ji bo pêşketina giyaneke înternasyonalistî di kesayetiya zarokan de bandoreke baş li zarokan dike.

dêgiravî danerê dewleta Tirkiyeyê M. Kemal ev roj, diyarî hemû zarokên cihanê kiriye! Ev gotin li her derê, bi taybetî ji di roja 23'ê avrêlê de di devê xwe xistine benîşt.

Ev rewş, bêguman bi rewşa siyasî ya kurdan ve girêdayî ye. Dewleta dagirker li aliyekî xaka zarokên kurd dagir kiriye, li aliyekî din jî bi vî nemaye, ji bo ku zarokên kurd fêrî zîman û çanda xwe nebin, bi her cure riyên kirêt li ber wan dibê asteng û qedexê dike. Qaşo ev dewlet, ji zarokan gelekî hez dike û ev roj diyarî wan kiriye! Ev rewş ji bo eşkerekirina durûtiya komara tirk minakeke berbiçav e. Wekî her tiştê vî dewleta dagirker, wateya cejnan jî hatiye guhartin. Cejnan ji bo nuxumandina kiryarên xwe yê kirêt ên li dijî gelê xwe û mirovahiyê bi kar tînin.

### Peymana Mafên Zarokan

Komara Tirk, ji ber ku di heman katê de endamê Neteweyên Yekbûyî ye jî, li gorî şertên endamtiya wê, gelek peymanên navneteweyî îmze kirine û di van peymanan de soz daye ku, van şertan bi cih bîne. Yek ji van peymanan jî, Peymana Navneteweyî a ji bo Mafên Zarokan e. Li gorî vî peymanê; zarok ji kîjan neteweyê dibin bila bibin, ji van mafên ku hatine diyarkirin, bi awayekî dadya-



Wêne: İkrâm İşler

Dibêjin werin li ser navê zarokên tirk tevî vî cejnê bibin. Belê, em ji zarokên tirkan jî hez dikin helbet. Em dixwazin vî cejnê bi wan re pîroz bikin. Lê em dixwazin li ser navê zarokên kurdan tevî vî cejnê bibin.





# Cejnên xwe li benda welatekî azad in

bi ser piyan dikevin û hîni rêveçûnê dibin, ji bo debara malbata xwe û yên xwe dest bi xebatê dikin. Daxwazên ku îro dewleta tirk divê bine cih, %90 zarokên ku li Tirkîyeyê dijîn re lûks e. Lê li hêlekê ev rewş, li hêleke din jî lidarxistin û pîrozkirina cejna zarokan.

## Ziyaretên bo rojname û konsolosan

Navenda Çanda Mezopotamya ji bo beşdarbûna şahiyên bo 23'ê avrêlê ji sala 1993'yan vir de, serî li gelek sazî û rêveberên dewleta tirk dan. Her wiha îsal jî serî li saziyên mîna; Serkaniya Giştî, Serokomar, Serokwezîr, T.B.M.M, Wezareta Karên Derveyî, Wezareta Karên Navxweyî, Wezareta Karên Çandî, Wezareta Karên Perwerdehiyê da. Ji bilî van, şaxên NÇM'ê ku li bajarên Tirkîyeyê û Kurdistanê ne, serî li walitiya wan bajarên dan, da ku tevî pîrozbahiyên 23'yê Avrêlê bibin. Di van serîlêdanan de dosya ku der barê mafên zarokên kurd de hatibû amadekirin. Armanç ew bû ku, zarokên kurd jî bi cil û bergên xwe yên neteweyî tevî van şahiyên bibin û çanda xwe bi gelên din bidin nasandin. Lê diyar bû ku, wê bersiva van hemû serîlêdanan neyînî were. Lewre pejiwandina vê daxwazê dihat wateya pejiwandana ziman û çanda kurdi ango pejiwandana nasnava kurdan.

Zarokên ku di bin banê Navenda Çanda Mezopotamya tîr perwerdekirin, van rojên dawîn, berî 23'ê avrêlê bi cilên xwe yên neteweyî rojnameyên Ûlkede Gündem, Hürriyet, Yeni Yüzyil, Radikal û Milliyet ziyaret kirin û daxwazên xwe yên ji bo 23'ê avrêlê anîn zimên. Di van serdan û serîlêdanan de, çi helwesta saziyên dewletê yên fermî, çi rojnameyên ku xeta wan a weşanê nêzî bîrdozê fermî ye û çi ji helwesta partiyên sîstemê ji hev ne cuda bû. Ev helwest jî tunehesibandina zarokên kurd ango tunehesibanina gelê kurd bû.

Li hêleke din rêveberên NÇM'ê serî li balyozxaneyên Amerika, Spanya, Îngilistan, Germenistan, Swisre, Îran û Îtalya da, da ku wan der barê maf û rewşa zarokên kurd de wan agahdar bikin. Bi konsolosên Spanya, Îngilistanê re hevdiştin hate çêkirin û dosyayên ku ji layê NÇM'ê ve hatibû amadekirin, dane konsolosan. Van soz dan ku, ew dê li ser vê mijarê rawestin. Ji hinek balyozxaneyan jî wan dosya xwestin ku lêbikolin û piştî re wan agahdar bikin.

Li gorî rêveberên NÇM'ê bi van serdan û serîlêdanan mebesta wan nîşandayîna, rastiya ku li gorî zagonên navneteweyî, mafên zarokên kurd ji layê dewleta tirk ve tîr bîrê dikin e. Ji bilî vê çawa ku gelek tune tîr hesabandin, zarokên wî jî tune tîr hesabandin. Divê dewletên ku piştigiriya Tirkîyeyê dikin, li xwe mîkur werin.



Serap Balık

*Me ji van çend zarokan, ku di bin banê NÇM'ê de di nav Gulên Mezopotamya de perwerdehiyê dibînin, der barê vê rojê û rewşa zarokên ku li Tirkîyeyê dijîn de, dîtin û ramanên wan standin.*

### Serap Balık:

Li gorî min cejnên ku îro tîr pîroz kirin, li gorî wateya xwe nayên pîroz kirin. Hem dibêjin hemû zarokên cihanê bira ne, divê bi hev re vê cejnê pîroz bikin, hem jî nahêlin ku em tevî vê cejnê bibin.

Li gorî min cudatiyê dixin navbera ziman û neteweyan. 23 avrêlê di kolana İstiklalê (Stenbol) jî hemû layên cihanê zarok tînin ba hev û li gorî ziman çanda xwe pîrozbahiyekê wê li dar bixînin. Çima zarokên kurd jî tevî wan nebin. Ez vî tiştî fêhm nakim. Çima nahêlin ku zarok werin ba hev, çima bi hev re stranên nebêjin? Dewlet jî bo ku durûtiya xwe veşêre, çi ji destê wê tê dike.

Dewlet hem dibêje zarok pêşeroja me ne, hem jî gelek tadeyan li wan dike. Zarokên ku dixebitin û ji ber vê yekê jî nikarin bixwînin hene.

Dewlet vê rewşê bi nezanbûna malbatan ve girêdide. Halbûkî dewlet mesûl e. Îro mesrefa rojekê ya mebûsan, debara salekê ya malbateke feqîr e. Zarok çima naxwînin û tîr xebitandin! Min dixwest bi zarokên cihanê re

Her çiqas nehiştin ku zarokên kurd tevî van şahiyên bibin jî, wan bi sazûmankariya Navenda Çanda Mezopotamya roja 19' avrêlê şahiyek li dar xist. Zarokên kurd, bi dilçûşî û beşdariyê mezînin û geş ev roj pîroz kir. Şahiya ku piranî zarok tevî bûn, bi xwendina sîrûda neteweyî dest pê kir. Zarokan dîr re mesajên xwe yên bi zaravayê kurmançî, kirmanckî (kirdkî) û zimanê tirkî pêşkêş kirin. Em dixwazin beşek ji mesajê wan pêşkêşî we bikin: "Em zarokên kurdan, îro li vê derê, dîrî welatê xwe hatine cem hev. Me xwest, ku bi tenê zarok li



Şahin Akman

vê rojê pîroz bikim, bi wan re bipeyivim û dîtin ramanên wan hîm bibim. Ji ber vê rewşê ez gelek xemgîn im. Zarokên hemû dinyayê bira ne, lê belê rayedarên dewleta tirk naxwazin vê rastiye bipejirînin.

Divê dewlet dev ji vê înatê xwe ya bêwate berde, em ê dawîya dawî bi zarokên cihanê re vê rojê pîroz bikin.

### Şahin Akman:

23'ê avrêlê cejna zarokan e. Me xwest, em li ser navê zarokên kurd beşdar bibin. Lê belê name û serîlêdanên me bêbersiv man. Em carekê heta ber stadyûmê jî çûn da ku em tevî van şahiyên bibin, çand û hunera gelê xwe bi zarokên dinyayê bidin nasîn, lê belê disa jî nehiştin. Em dixwazin vê rojê di nav aştiyê de bi zarokên dinyayê re pîroz bikin.

Dewlet dixwaze, em li ser navê tirkan tevî vê pîrozbahiyê bibin. Em dixwazin bi vî awayî jî çanda û hunera gelê me, wekî çand û hunera gelê tirk were pêşkêşkirin. Dibêjin her kes tirk e. Em dixwazin vê rojê, li welatê me tevî zarokên ku tîr perçiqandin pîroz bikin.

Divê zarok bi tu awayî neyên xebitandin. Zarokên ku dixebitin min pir xemgîn dikin. Hem dibêjin em ji wan hez dikin û hem jî wan didin xebitandin. Divê zarok bixwînin. Ez naxwazim bibim serokomar. Divê hemû î-

vê bernamêya me temaşê bikin. Ji ber ku zarok, ji zimanê hev behtir fêhm dikin. Aştiyê behtir dixwazin, azadiyê behtir dixwazin... Nahêlin em tevî Cejna 23'ê Avrêlê bibin. Ji ber ku cejn aştiyê ye, divê pêşî zarokên kurdan tevî vê cejnê bibin. Dibêjin werin li ser navê zarokên tirkan tevî vê cejnê bibin. Belê, em ji zarokên tirkan jî hez dikin helbet. Em dixwazin vê cejnê bi wan re pîroz bikin helbet. Lê em dixwazin li ser navê zarokên kurdan tevî vê cejnê bibin. Ji ber ku em zarokên kurdan in. Zimanê me kurdi ye, stranên me bi kurdi ne..."



Burusa Çirik

san wekhev bin. Lê belê ku ez bibim serokomar, ez jî bo berjewendiyên xwe kar nakim. Pêşî ez dê pîrozgîrêka perwerdehiyê çareser bikim, kesên ku pêwîstiya wan a xwarin û cilan heye, ezê pêdiviya wan yekcar bi cih bînim. Ez ê ji bo ku zarokên ku tîr perçiqandin weqfan vekim û wan perwerde bikim.

### Burusa Çirik:

Li mektebê jî me re digotin, ev eyd (cejn), eyda zarokên Japon, Amerîkî, Rûsî û eyda hemû zarokên cihanê ye. Lê belê ji ber ku em kurd in nahêlin ku bibe eyda me jî. Em jî dixwazin wekî zarokên cihanê vê cejnê pîroz bikin.

Li gorî min dewlet jî zarokan hez nake. Min di televîzyonê de dît, lawîkekî bi qasî min, mezinên dewletê roja 23'ê avrêlê zarokan datînine ser sandalye xwe. Qaşo bi awayî jî zarokan hez dikin. Ew derewan dikin!

Ez dixwazim cejn biratiyê geştir bikin. Ku biratiyê bê, wê aştiyê jî bê. Eger ez rojê bibim serokomar, ez ê herim Kurdistanê, ji bo zarokên ku naxwînin dibistanan vekim.

Eger welatê me azad bibe, em ê gazî hemû zarokên cihanê bikin û bi wan re vê rojê pîroz bikin. Ez dixwazim tiştêkî din bibêjim, divê zarok, di tevgerên xwe de azad bibin û wateya şer tu caran nizanibin.

Bi stran, danîşana Dîyayê, şano, govend û xwendina helbestan şahiyêke tîr tîjî hate lidarxistin. Di şahiyê de tiştê herî balkêş, sewiyeya polîtîkbûna zarokên kurdan bû. Zarokên kurdan ne wekî zarokên neteweyî din in. Hin ji wan wekî teorîsyenyan dipeyivîn. Zarokên ku beşdarî şahiyê bûn, bi stran û tevgerên xwe, ji zarokan behtir wekî mirovên tîgîhiştî qala şoreşê dikin û bi hestên xwe yên paqij daxwaza aştiyê û azadiyê qîriyan.

MUSTAFA D. DEMİR

**N**a, na. Min navê ligel te biçim. Ez bawer nakim ku, bi çûnê ez dê kêfxweş bibim; rojên zarokatîyê buhirin û dem jî, ne ew dema berê ye.

-Nexwe tu xwe baş nas nakî. Dema tu li rabirdûya xwe vegefrî, tu yê her tiştên dîtir ji bîr bikî. De hilo! Em herin.

Zivîrî, pišta xwe da min, bê ku li benda bersiva min bimîne. Tivinga wî ya kevnar hê jî, berf li asmên, xwe bi milê wî ve girtiye. Bi rê ket û li hêviya min nema.

Piyên min, li ser şopa gavên wî yên jixwebawer, radibûn û dadihatî. Çavên min jî, her seyra bejn û bala wî ya jar dikir. Hêdî hêdî û bédudilî wî berê xwe da derî.

Wisa apê min qinyata min anî-her wekî rojên zarokatîyê- ku ez digel wî herim; carinan min çûkên nêçîrkîrî hildigirtin, carinan jî min tiving ji ber wî ve hildigirt û gava jî min re lê dibat, min çend berik berdidan hin nîşanên bêhûde.

Wî gote min: "Tu vê riyê nas dikî?"

Her car em di vir re diçûn goristanê. Çi riyê hêmin e! Darên tûyan û şengbeyan, sîberên xwe li ser qadê radixistin, da bibin hêwirgeha balinde û bêwaran. Belê, belê ew e marê rengexakî yê dirêj, yê ku me dikişîne wargehê mirinê. Çi kesê derbasî wêderê dibe, yan jê derdikeve, dibe bindestê nîşan û berjengên jidûrketin û mirinê. Min ev got-

## Siya apê min a giran

tin bo wî negotin.

Bêdeng, ez li pey vedenga gavên wî de çûm. Gote min:

-Nêçîr li nav van daran pir e, teyr û tîlûr xwe li tenahiya û bédengiya goristanê digirin. Ev kêlên kevîrî yên sipîçolîkî wan diparêzin.

Min di dilê xwe de digot:

-Em in, mirovên bêcîr û zivêrker yên ku tenahiya zelal a vê xakê û van teyr û tîlûran şêlû dikin. Gewdeyê vê cihê ya aram, bi gavên xwe yên qurs û giran birin dikin. Û bi dengên xwe yên nesaz, ahenga wî ya yeksanê tarûmar dikin... Min ev tişt bo xwe got û çavên min her li dûmana cigareya apê min bûn, dema xwe ji bo nêçîrê amade dikir.

-Raweste! Bihêle ez nîşan bigirim, bila destpêka xêrê be! Wisa ji min re got.

Gurmîna tivingê cih dadigirt. Bi vî awayî hindek giyanên nû, jiyane li cih dihêlin û diçûn dinyayêke din. Dinyayêke ne gelekî dûrî me. Tu tişt me ji wê cuda nake; ne cih, ne dem, ne jî rêkewt, her tenê hişyarbûneke sivik, dihêle ku em riya vegeerê binasin.

Çûkên hilqetandî êdî di destê min de kom dibûn, destê min bi wan sor di-

bû. Periyên wan ên nerm û mirî, xwîna germ û her du destê min, her diçe li wan tên şidandin...

Roj topekeke sor, mezîn bû, hêdî hêdî diçû ava û firêjên xwe yên melûl diavêtin dewrûbera min li vê cihê bédeng.

-Nîha jî dora te ye. Ha ji te re tiving, rahêje!

Apê min ev bo min got.

-Na, na ez naxwazim.

-Rahêje! Tu vê çûka nêzik a li ser kêlê dibînî, ew gelekî nêzik mirinê ye. Tivingê berde wê!

Min rahişt tivingê û min hewl da xwe ku ez nîşanê bigirim. Lê destê min dilerizîn, min nedikarî desthilatdariyê li wê bikim. Çûka belengaz û reben li ber qedera xwe bêçare ma. Ew gelekî nêzik e, bêbizav e. Tu dibê qey neçariya xwe beramberî viyana xurtir berbiçav dike. Gelo yê xurtir ez im?!

Çûka pepûk perpiti. Apê min hêdî hêdî bi aliyê wê ve çû, bi baskê wê girt û rakir.

-Her bijî! Gelekî baş e! Te li sînga wê da. Erê, te hîn nîşandariya xwe ji bîr nekiriye.

Ez bédeng bûm. Tirêjên roja li ber ava, sorahiya xwe li ser rûyê erdê, li ser

kevir û kêlên spî radixistin -diavêtin ser tilikên apê min ên ku di nav periyên çûkê re dirêjî serê wê dibûn û ew ji gewdê wê hildiqetandin.

Apê min, gewdeyê çûka perpiti bi ser min de avêt, li rex kêlê rawestîya, sîbera wî li ser xaka sor a nivistî belav bû.

Bayê berêvarê yê sivik şaxên daran dihejandin, pêl dida û li kirasê apê min û li çavên min dida. Lewre min tiving ajote ber. Ez rûniştim da nîşanê bigirim. Belê niha bi rastî min dil heye ku ez tivingê berdim. Gurmîna wê bilind bû, hûrikên keviran ji kêlê firiyan û dahatin.

Ez rabûm, tiving di destê min de berf li asmên e. Apê min bi dîlsarî li min dinêrê. Pirsiyareke sermedî di çavên wî de ye: "Law! Te çi kirî! Te dikirî ez bikuştama!!" Bêdeng bû, çavên xwe ji min nedibirin.

Min tiving li erdê, li ber termên çûkan danî. Min negot: "Sîbera te, Melkematê mirinê yê reş e, li ser kêla spî venişt." Lê min got:

-Ez dê vegeerim malê.

Berê xwe ji min da alî, ponijî û bi pêşvehatina tariyê ve mijûl bû. Bi dilnêrmî got:

-Law! Hay ji xwe hebe! Tu di vê tariya giran de, riya xwe wînda nekî.

ISSLAH EBDULFETAH

Ji erebî bo kurdî: Ehmed Hesên

**S**orê ewqas pir giriya ku, di dawî ye de bi îskikan ket. Destê wê yên ku li çogên min pêçabûn, min bi dijwarî vekirin. Min, ew hem-bêz kir û bir ser nivînê. Li wê derê bi têra xwe giriya. Wekî ku li cem min fedî bike, serê xwe xistibû bin balgîvê. Lê belê destê min hişk xistibûn nav lepên xwe û bi hemû hêza xwe, bi ser dilê xwe de diguşişand.

Hêdî hêdî haş bû. Lê belê dîsa jî serê xwe ranedikir. Sê çar çaran awirên bi tirs avêtin min. Di awirên wê de dilgermiyêke xurt û hestiyariyêke nediya a bi tirs hebû. Piştî rûyê xwe careke din xist nava balgîvê.

Min got:

-Sorê ya min a diltenik! Keça min a nexweş! Tu çawa yî? Tu baş î?

Rûyê xwe ji min veşart û bi dengêkî zîz û lertzok gote min:

-Bi wî navî bang li min nekin....

-Nexwe ez çi bibêjim.

-Bêje Axîn!

-Te got Axîn. Çima Axîn? Erê! Axîn navekî xweş e. Ji ber ku tu wisa dixwazî, ez ê bibêjim Axîn.

-Diya min wisa bang li min dikir. Bêyî wê tu kesî bi wî navî bang li min nekiriye. Ez naxwazim kesekî din, bi wî navî gazî min bikê. Lê belê ez dixwazim hîn ji min re bibêjin Axîn. Ezê her dem ji hez we bikim.

Çi dilekî serbilind û paqij. Keça biçûk dema haş bû, min gote we:

-Axîna min! Li min guhdarî bike. Tu dibêjî, ji xeynî dayika min tu kesî ji min re nedigot Axîn û bi min şa nedibû. Lê kalikê te, ma wî jî te hez nedikir?

## Axîna Sêwî



-Na

-Lê dema te bihist, ew miriye, tu gîriyabû. Ma te ji bîr kir?

Kelîkê ramiya:

-Na! Hez ji min nedikir... Miroveki pir pîs bû.

Dema ew got. Mirûzê wê tirş bû û êşeke nediya lê xuya bû.

Min got:

-Gerek e mirov tişteki wisa ji wî hêvî neke. Dema mir xurîfbû. Ha çawa miribû, min bo te vegotibû?

-Belê; got!

-Berf mirina xwe bi mehekê, heta tu karî bejî dîmîkî bûbû. Bes hetanî êvarî rûdinişt. Ku ez nehatama, dikarîbû bexwarin û vexwarin sê rojan rûnişt. Lê belê berê bastir bû.

-Berê çi ye?

-Berf, dayika min bimire.

-Nexwe xwarina wî te diani Axîn.

-Belê.

-Te ji ku diani? Ji jinîka çiran Xem-sê!

Bi dengeke kelogirî û zîz got:

-Na! Min ji mala wê tu çaran tiştekan nestand.

-We gavê te xwarina wî ji ku derê diani?

Axîn sekinî, mîna miriya zer bû. Peyre bi xemgînî li ber nihêrî;

-Min li kolanan parsekî dikir... Penc qurîş dema bi dest min bî ketena, min jê re nan û titûn dikir.

-Wî, ew qebûl dikir Axîn?

-Min di serî de nedigot, ez parsekiyê dikim. Lê belê dema ew hîn bû, wî ez şandim. Ez li ser rê disekinim. Min ji kesên ku diçûn û dihatin, pere dixwast. Ew jî li derekê disekinî û li min temaşê dikir. Dema yekî tiştekan bidaya min, wî hema xwe diavêt ser min û ji min distand. Te digot qey min ê jê şartana. Ango min ji bo wî parsekî nedikir.

Dema wiha got, hinekî bişirî û domand.

-Ew tişt gişk piştî mirina diya min qewimîn.

-Ku ji dayika te pir hez dikir lê çima bi were nedima?

-Na! Ji diya min jî hez nedikir. Miroveki xedar bû. Ne dixwest diya min bibexşîne. Lewre dayika min, ew di cihê de hiştibû û bi bavê min re reviyabû.

Ez veciniqim. Girêya dramekê li ber çavê min çirîsî. Di axokî de, ew jinîka reben, ku nava mişk maran de mirî. Keçika sêwî, ya ku kalikê wê diya wê lanetkîrî ye, her roj ji bo kalikê xwe parsekiyê dike û pey mirina seyê xwe re, li teniştî sergokî, di bin rojnameyan de termê kalekî.

M. MÎRXAN

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● 25 avrêl 1998 şemî: Panel: "Rewşa Rojnamegeriya Kurd"

Rêvebir: Nîjad Yaruk Beşdar; Armanç: Yakup Karademir A. Welat: Sami Tan  
Hêvî: Fehim Işık Nûbihar; Süleyman Çevik Stêrka Rizgarî; Nevzat Sağnîç  
Saet: 13:00

Ji şaxa NÇM'ê ya Edeneyê "Teatra Yekbûn" şanoya bi navê "Agirê Gel"  
pêşkêş dike. Saet: 17:30

● 26 avrêl 1998 yekşem: Konser: Hozan Xanemîr Saet: 14:00

Şano: Teatra Yekbûn (Agirê Gel) Saet: 17:30

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



NÇM-Izmir

● 25 avrêl 1998 şemî: "Roja Xwarinên Kurd ên Gelêrî"

● 26 avrêl 1998 yekşem: Şahiya Zarokan

"Em kûlîk in, bêhna me bêhna Kurdistanê ye" Saet: 14:00

Konser: Koroya NÇM'ê Saet: 17:00


● 29 avrêl 1998 çarşem: Panel: "Muzîka kurd a neteweyî û arîşeyên wê"

Beşdar: Arya Kültür Merkezi, MED-KOM, NÇM, Stran Kültür Merkezi  
Saet: 18:00

● 2 gulan 1998 şemî: Çalakî: Çalakiya dayikên şemiyê, saet: 17:00

# Pêşbaziya duyemîn a kurteçîrokan

**Xebatên çand û hunerî bi pêş nakevin. Bi tenê li ser nîrxên şer hin tişt hatine çêkirin. Mixabin heta niha xebateke orjînal derneketiye holê.**



**P**îştî ku sala çûyî yekemîn car pêşbaziyan kurteçîrokan tê lidarxistin. Beşa Sînemayê ya NÇM'ê îsal jî pêşbaziya kurteçîrokên bi kurdî û bi tirkî li dar dixê.

Xebatkarên Beşa Sînemayê ya NÇM'ê ragihandin ku, ji ber ku pêşbaziya par bi beşdariyê berfireh pêk hatiyê, wan pêwîstiya sazkirina pêşbaziya duyemîn ditiye. Kesên ku dixwazin beşdarî vê çalakiyê bibin, divê heya roja 15 tîrmeha 1998'an berhemên xwe bo NÇM'ê bi rê bikin. Bi pey agahiyên sazûmankarên pêşbaziyê, divê kurteçîrok li ser kompîturê hatibin nivîsandin û ji 10 rûpelan neborin. Her wiha divê kurteçîrok berê nehatibin weşandin.

Lijneya nîrxandinê ya kurteçîrokên bi kurdî jî van kesan pêk tê: Helîm Yusiv, Firat Cewerî, Hasan Kaya, Sami Tan, A. Rahman Çelîk. Lijneya nîrxandina kurteçîrokên bi tirkî jî van kesan pêk tê: Ahmet Soner, Semir Aslanyürek, Işık Kutlu, Hasan Kiyafet, Kazım Öz. Hata gotin ku 15 kurteçîrokên ku par xelat wergirtine, wê ji layê Beşa Sînemayê ya NÇM'ê ve bînin weşandin. Her wiha kurteçîrokên ku beşdarî pêşbaziyê bibin, wê ji bo senaryoyên filman jî bînin nîrxandin.

Endamê Beşa Sînemayê ya NÇM'ê Kazım Öz li ser armanca pêşbaziyê ev nîrxandin kir: "Armanca me ew e ku em kesan teşwîkî nivîsandina çîrokan bikin, bi riya vê yekê wêjeya nivîskî wê bi pêş bikeve." Li ser çîrokên ku heta niha ketine destê wan Öz dibêje: "Hin çîrok hene ne hêjayî xwendinê ne; bêhtir hel-

bestî ne, an jî wekî nivîsên ceribandî ne." Di gel vê gotinê Öz jî diyar dike ku, mirov dikare bi saya van çîrokan, têkoşinê nas bike. Kesê ku der heqê tevgera azadiya gelê kurd de ne xwedî agahî ye, bi xwendina van çîrokan dikare bibe xwedî agahiyên dorfireh. Her wiha li ser destpêka vê xebatê ew dibêje: "Diyabû ev pêşbazî di sala 1990'î de li dar bihata xistin." Ew jî derengmayînê rewşenbîran berpirs digire.


Kazım Öz qala kurteçîrokên ku ji girtîgehan tên kir û ev nîrxandin kir: "Ew kurteçîrok hin tiştan dubare dikin, lê tevî vê yekê jî ji yên ku derva tên hê watedartir û kûrtir in. Kesên ku ji bajarên ji me re çîrokan dişînin ne ji dil dinivîsin. Lê yên di girtîgehan de ji dil û kurtir dinivîsin. Divê bê gotin ku girtiyên siyasî hin caran dixwazin mafdariya Tevgera Azadiyê di çîrokê de bidin nîşan, ew yek car caran di çîrokê de pir derdikeve pêş. Ev yek jî naverok û teşeya kurteçîrokê serobino dike."

Di sa li gorî Öz, di çîrokê de ziman jî gelekî girîng e, heta hêmana hêrî girîng ziman e. Ew dibêje ku di kurteçîrokên nivîskarên kurd te problema ziman gelekî berbiçav e. Lê dema ku yekî biyanî ji devla wî binivîsîne, bi sînamegeran hê balkêştir tê. Ji ber ku ziman şahîk e, hêjayî xwendinê tê dîtîn. Ji aliyê din ve mantiqê kurdî di hemû kurteçîrokan de bi awayekî zelal tê dîtîn.

AZAD AVAŞIN

## TÎŞK

### Ma û ê



LERZAN JANDÎL

**B**ê guman dîroke de şaran û kesane bindestan, koledaran ra gelê anto. La belê mordem şîkîno nê zulm û zordariyan ebi dîroke, ebi avêr yan jî pâyde mendena însantiye, ebi şîklê dewletan, ebi dîn yan jî normanê ahlâqî îzah bikero..

Ner derheq de çîyo tewr klasîk eke mordemî kê yewbînan/jûbînî nas mekerê, yewbînan ra bitersê, yan jî xo girs, ê bînan qij bivînê (Êke naca mesele, meseleya koledariye û polîtîka mebo) şîkîne zulm re yewbînan bikerê. Kamî ke bine de mendî, ê kenê vîndî. Naca demê barbariye mîsalêde rind o.

Yan jî ma vacîme yew dewlete, yew şarî, şarêde bîn kerdo bindest, kerdo kole û angore naye jî zulm kenê. Ma naye kolonyalizm de zaf eşkera vînenîme. Yan jî sedsera 20'an de zulm û zordariya faşîzmî, şovenîzmî-nîjadperestiye- vînenîme û naye şîkînîme îzah bikerîme.

La belê mordem nêşîkîno, çîyêke nê rojanê pêyniye de Tirkiye de benê, çîyêke şoven û faşîst tirkan kenê, fam bikero. Mordem nêşîkîno, televîzyonê, rojnameyanê tirkan, polîtîkvan û gelê nivîskarê tirkan, partiyanê tirkan fam bikero. Wunciya mordem nêşîkîno, bêvengiya şarê Tirkiyeyê bînî fam bikero. Yew ca bifikirê, ke şarê nê cayî, dewleta serê nê hardî vanê; "Hemdemiye? ma. Kultur? ma. Teknolojî? ma. Însaiye? ma. Muslumanîye? ma. Xebetsar? ma. Pur û pak? ma. Laik? ma? Demokrasî? ma. Mafê însanan? ma. Adeleto tewr girs? ma. Polîs û leşkero tewr girs û alîcenap? ma. Yanê serê hardan ra her çîyo rind na yme, yan jî koka xo ma ra êna"

Wunciya yew ca bifikirê, ke naca hemverê şarê de bînî, hemverê şenikiya, hemverê fikranê ciyan, hemverê bawarî û dînanê binan qe yew prensîbêde çîyanê corênan, yanê etikî-ahlâqî, dînî, kulturî, hemdemiye, demokratiye, pur û pakiye çîne bo.

Wunciya yew ca bifikirê, ke naca erdemê ke raya raşte musnenê însanî, însanî kenê berz, însanîtiya însanî musnenê ci, seba xirabiye, seba kiştene, seba zulm û zordariye, koçberîye ênê xebatnayene. Wunciya no ca û cawo corên eynî cay bê. Û naca jî Tirkiye bo! Tawo ke ma niya bifikirîme, no nêbeno fantazî, no beno raştiya Tirkiye.

No senê şeref o, no senê ahlâq o, na senê welatparêzî ya, na senê demokratiya ya, no senê dîn o, no senê ahlâqê lecî yo, ke "kes", -ma şehîdan, pî, bira, wa û cênîya şehîdan", medyaya dînan tahamûlê cesedê merdanê "ê bînan" yanê merdanê ma nêkeno?

Mordem xo ra perseno, nê ebi nê hîsterî, ebi nê 'ma' û 'ê' yanê ebi na dişmeniye, ebi na bêtahmalûye, ebi na bêahlakiya dîniye wazenê, ke çî mendo pêy ra?

Ez bawar kena, ebi nê pêlanê şovenan, ebi nê hîsterî dewlete, serdestî wazenê, ke şarê Tirkî jî, yan jî zafêriya şarê Tirkî bikero şîngê sîcanê xo. Koledarî wazenê, ke wa yew tirk, yew hetkarî wazenê, ke yew psikolojiyêde "ma û înan" virazo û owo ke estî avêr bero, bikero zixmêrî, wa hêrî zixm bo, ke însan erdemane mordematiye xo vira bikero, bibo cinawir, xêca ê xo ra, bibo ezrailê her kesî.

Bê guman koledarî naca de tenê jî avêr çîye, Tersê mi o wo, ke no hîsteriya şarê tirkî bigêro zerê gujgeleka xo. O taw jî qiyameta ke vanê êna û karê qiyamete qe kesî rê çîna.

Seba naye jî her çî ra ver, ganî roşnavîrê tirkan, xebatkar û dewijê tirkan, huna ke herê niyo, huna ke zaman esto, hemverê na bêahlakiyê veciyo. No her çî ra ver karê dînan o.

**MERHEBA!**

Zarokên hêja, wekî me berê jî gotibû, ev rûpel ji we re hatiye veqetandin. Ji du hefteyan carekê em ku berhemên we ji me re şandine diweşînin. Me divê hûn çî helbest, resim, lîstikên zarokan, û hwd. ku hûn dizanin an jî we bihîstîye ji me re bişînin.

Hûn dikarin bi riya nameyên mesajên xwe jî bişînin. Herwiha ku hûn fotografekî xwe jî bi berhemên xwe re ji me re bişînin, emê wan jî biweşînin.

Em hêvîdar in ku hûn jî vê rûpela xwe hez dikin.

Heta hejmareke din bimînin di xweşiyê de...

**Ez Keçîkek Biçûk im**

*Ez keçîkek biçûk im*

*Bi dergûş im, bi bûk im*

*Ez keçîkek xweşik im*

*Xwîşêrîn, çavreşîk im*

*Ez keçîkek zerîn im*

*Devliken, xemrevîn im*

*Ez keçîkek gundî me*

*Pir hişyar û zindî me*

*Ez keçîkek paqij im*

*Bi serbilindî dijîm*

*Ez keçîkek çavşîn im*

*Porzer im, çî şêrîn im*

*Ez keçîkek kurmanç im*

*Bisk xelek, ser bi tac im*

*Ez keçîkek gorî me*

*Xwişka kesê sorî me*

*Ez keçîkek dimilî me*

*Porsor im, bi gulî me*

*Ez keçîkek Başûr im*

*Keça gelê Mişûr im*

*Ez keçîkek Bakur im*

*Wekî teyrîkan difîrim*

*Ez keça Rojhilat im*

*Xeml û xêza welat im*

*Ez keçîkek pir jîr im*

*Warê bav û bapîr im*

*Ez keçîkek rêwî me*

*Bo gelê xwe hêvî me*

*Ez keçîkek bi fîstan im*

*Kulîlka Kurdistan im*

(Diyariya Adar Jiyan ji rûpela zarokan re)

Ento mento gû tune  
Serzelûto mû tune  
Xwîn heye parsû tune

(qijnik=genek)

\*

Sêsed şêst şeş legleg  
Nîvê reş nîvê belek  
Diwazdeh ga du çêlek

(Sal, roj û şev, meh, du id)

\*

Reş e reş e wekî qîr  
Kutîlka çêdike wekî jina  
mîr

(Kêzîka reş)

\*

Ser marmark e ne mar e

Yek a nakê  
Du bîstanê  
Xultîzanê  
Gula çepê  
Çep li minê  
Xana gijê  
Dostê îne  
Ser kişîne  
Heba tirî  
Du kindirî  
Xulxule ye  
Çam û ce ye  
Barûde ye  
Para te ye  
Ev a min e  
Ew a te ye

**Tiştonek**

Pişt darik e ne dar e  
Dimikmike ne kar e

(Kusî)

\*

Sing li vê dikutim  
Golik li wê çêdibe

(kundir)

\*

Hêstira qerol bêndero  
Ne gur dixwe, ne diz di-  
be

(Simbilê genim)

\*

Beranekî me heye  
Çil dû li paş me

(Barse mêşê)

\*

Sînê ser sînê ye,  
Deng diçe Hêseyniyê

(Tiving)

\*

Kulekê tutik, tije nûtik

(Stêrk)

\*

Deh apê min hene,  
Deh sêl li piştan e

(Pêçî û neynûk)

**Mamik**

Ev hivde ye  
Ew hijde ye  
Nozdeh a wan  
Bîst li te ye  
\*\*\*

Yek dudo  
Bawer sisê  
Çeqla nisê  
Mamo  
Dîno  
Kevirê şîno  
Qesra Elî

Çardeh derî  
Yek jê tê der  
Yek jê ne der  
Ellah û ekber  
\*\*\*

Ho kulo  
Bendê kulo  
Çarê Çemo  
Miskê Emo  
Tasa Nislê  
Gawir neqlê  
Hepen  
Zepen  
Mîro  
Yaro  
Kurtîro

# Êrdima qedexekirî *Li nav Kurdistanê rêwîtiyeke nîgaşî:*

Diyar e, bi tenê li biyanistanê best li kurdan radibe. Kurd, li "Welatê Xeribiyê" bi karê wêjeyê radibin. Her çendî ev encameke asayî be jî lê ji bo kurdan ev rewş diyar û berbiçavtir e. Lewre piraniya xebatên wêjeyî yê kurdewarî li biyanistanê geş bûne. Pirtûka Nejdê Buldan a bi sernavê "Yasaklı Topraklar (Êrdima qedexekirî)" vê yekê diselmîne. Ji ber ku Buldan, her çiqas bi karûbarê siyasî radibe, li biyanistanê, serpêhatî û nîgaşên xwe yê der barê Kurdistanê de, bi şeweyekî wêjeyî nivîsandiyê.

Endamê PKDW'ê Nejdê Buldan, serpêhatî û xeyalên xwe bi şeweyekî serketî û zimanekî çêjdar û şahik honandine. Mirov piştî ku dest bi xwendina pirtûkê dike, hew dest jê berdide. Pirtûka "Êrdima Qedexekirî" ji aliyê Weşanxaneyê Aramê ve hate belavkirin.

Pirtûk ji du beşên ku bi hev girêdayî ne, pêk tê. Beşa yekemîn li ser rêwîtiyeke nîgaşî ye û bi navê "Rêwîtiyên Xeyalî yê ji bo Kurdistanê" ye. Di vê beşê de bedewiya surîştê Kurdistanê hatiye vegotin. Nivîskar, hestên xwe yê bo bihara Kurdistanê wiha tîne zîmên: "Tiştê ku neguhere spehîtiya Kurdistanê ye. Bi taybetî spehîtiya biharên Kurdistanê ji bo yekî ku li Ewropayê dijî, bêhtir xwe dide der. Surîştê dere-

wîn a Ewropayê... Ax û kulîkên ku bêhn nadin. Li wir tiştên ku pêrgîniya biharê dikin, tev bêgiyan û bêçoşî ne. Çivîk jî..." Di vê beşê de xwendevan ligel nivîskar derdikeve "Rêwîtiyeke nîgaşî (sanal yolculuk)", pê re li xweşikiya Rûbarê Şîn temaşe dike. Digel Şivan Tajdîn diaxive, çaya qaçax vedixwe û titûna qaçax dipêçe. Dîsa fêrî razên (sir) Mihemedê Esxet dibe û li çîroka serhildana Oremar guhdarî dike.

Li aliyê din xwendevan fêrî gelek navên nebatan ên bi kurdî jî dibe. Kesên ku vê biharê ji bo çûyîna Kurdistanê dudil in, bila vê pirtûkê bixwinin.

Gava mirov pirtûkê dixwîne, bivê nevé di dilê xwe de dibêje: "Ev pirtûk çima bi kurdî nehatiye nivîsandin." Ji ber ku mirov, bi taybetî di beşa yekemîn de, tev bi kurdî li sohbetan guhdarî dike. Li aliyê din diyar e, li ber destê Necdet Buldan gelek malzemeyên wêjeyê henê, ji ber vê çendê dikare di vî warî de berhemên têrtîjî biafirîne.


## Gerîla tûrîzm

"Gerîla, ê ku gel stran avêtin ser. Hêviya neteweyekê ye. Vê gavê ez bûm dayika hemû gerîlayan. Tev rûgeş in. Ez a niha dikarim bi ser bombeyê atomê de biçim. Ew kesên ku li ber artêşê, ku di cihanê de nav û deng daye, radibin û ew kesên ku em li ser pişt

û xwîna wan demagojiyê dikin..." Ev gotin ji beşa duyemîn a bi navê "Êrdima qedexekirî" hate wergirtin. Buldan di vê beşê de, serpêhatiyên xwe yê li ser gera Başûr nivîsandine. Di vê gera ku payîza 1996'an pêk hatiye de, Zübeyr Aydar, Nizamettin Toğuş û Mahir Sayin ji cih girtiye. Di vê beşê xwendevan ligel gerîlayan bi botê rêwîtiyê dike. Li ser rewşa gerîlayan û Başûr fêrî agahiyan balkêş dibe. Mirov diçe serdana Yadê, ku 4 lawên wê şehîd in û du jî gerîla ne. Gerîlayên Pakîstanî, Almanî û

Rûsî dinase. Li çîroka du gerîlayên jin, ku 84 rojan tenê li çiyayê jiyane, guhdarî dike. Her wiha dibe rêwîngê "Gerîla tûrîzm". Dîsa dilgermiya malbatên aşûrî dibîne. Mirov, bi gerîlayekî ku lawê serokcerdevanekî navdar e re dipeyive

## YASAKLI TOPRAKLAR



NEJDET BULDAN

û keysperestiya hêzên Başûrî dibîne. Bêguman tiştê herî watedar û hêja serdana bo Kampa Etroşê ye. Tiştê her balkêş jî li eniya şer, ji bêhemdî li hev-rastina Nejdê Buldan û lawê wî ye.

MAZLUM DOĞAN

## Li Welêt: "Xebat û kêf û şer e."

HASAN KAYA



Her cara ku ez berê xwe didime Welêt, hinek hestên ku ez nikarim wesfê wan bidim, di dilê min de çêdibin.

Bêguman çêşê mezin di nav vê hestariyê de heye. Lê ji xeynî çêşê, ez bawer im tiştêkî mîna tilsimê; ku ez ji tînağihêjim, bi min re çêdibe. Vê carê jî piştî ku erebeya me ji Dîlûkê derbas bû, ez ketime fikar û gumanan. Celo çî guherîn li Welêt çêbûye, cihên ku ez dê li wan bigerim, Nisêbîn, Mêrdîn û Amed di rewşê çawa de ne û hwd.

Nêzî salekê ye ku ez neçûme Welêt. Lê sala çûyî sê rojan li Welêt mabûm. Wê demê jî Cejna Qurbanê bû. Ez zêde negeriyabûm. Bi tenê min cejna hinek malan pîroz kiribû û çûbûm serdana goristana şehîdan. Îsal jî ez sibeha cejnê çûm. Bi dehan mirov li wir bûn. Kulîkên cur bi cur li ser singê goran hatibûn çandin. Mîna bexçeyekî gulan bû goristan. Mirovê ku li goristanê dinere, bihîst ku em jî dîr hatine, bi xêr hatin da me û em yek bi yek li ser gorên şehîdan gerandin. Em li ber kîjan gorê radiwestiyan, wî, der heqê şehîd

de em agahdar dikirin. "Ev gora Mehmet Şîrîn Önen e. Ji zindana Îskenderûnê reviyabû lê dawî di şer de şehîd ket." Gelek gor li goristanê zêdebûn. Par gelek ji wan

şehîdan, nas, dost û hevalê min bûn. Dema mirov li ber gora Şîrîn Önenê a nivîsara kêla wan dixwîne, gelek di bîrî mirov de berbiçavtir dibe. Bawerî û girêdana bi şoreşê ve wekî avake zelal û xwerû dibe. Wê demê hemû raman ji ser hişê mirov xwe didine aliyekî, bi tenê şehîd û şoreşê tê ber çavên mirov. Ez bawer dikim, wê kêfîka taybet, tu kes nikare xwe ji du dilop hêstiran biparêze. Veqetandina ji ser goristanê wekî çûyîneke bêveger e. Çûyîneke gelekî dîr û ku mirov xatir ji tu kesî nexwaze ye.

Gava min biryara çûyîna Welêt da, min zanibû ku gelek dost û heval dê pîrsa teslîmbûna Şemdin bikin. Min ji nêrîna wan a der barê vê mijarê de mîraq dikir. Wekî gelek tiştan, ev nêrîna gelê ku li Welêt dijî ji cihê reng bû. Nêrîneke gelek xwerû û mûwezî bû. Kesên ku ne rojname û kovarên kurd xwendibûn û ne jî li Telewîzyona Medê temaşe kiribûn lê bi tenê telewîzyonên tirk temaşe kiribûn, li gorî xwe gihîştibûn baweriyê. Yekî kal wiha digot: "Heta niha Şemdin bû, lê êdî ew Şemo ye." Lê hêla Mêrdînê peyva Şemo, ji bo kesên beredayî tê bi kar anîn. Yekî din digot: "Kî qenciye bike û bi xwe dike, xerabiye bike, bi xwe dike. Ma

Şemo ji Egîdê Mala Qaso mezintir e?" Fermanarê Eyaleta Mêrdînê Faysal Kut ê ku li herêmê bi navê Egîdê Mala Qaso di hate nasîn, xiyaret kiribû. Gelek tade li gel kiribû. Dewletê ew gund bi gund, qehwe bi qehwe gerandibû û li dijî şoreşê dabû axaftin. Dawî jî ji aliyê artêşa gelê kurd ve hatibû cezakirin.


Ez dikarim bibêjim, hinek mirov ne tê de lê bi piranî gel qerf û henekên xwe bi "îşkenceya psîkolojîk" a çapemeniya tirk dikir. Lewre rojnameyên tirk bi roj gotibûn, fermanarên gerîlayan Murat Karayılan û Cemil Bayik reviyane. Lê wê êvarê yê ku li Telewîzyona Medê temaşe kiribûn, dengê van fermanaran bihîstibûn. Jixwe "telewîzyona kurte pistê" ji hemû navgînan ragihandinê bi hêztir e. Roja din ev nûçe, li hemû herêmê belav bûbû. Yê ku telewîzyona wan Med nedikişand jî, ev derew bihîstibûn û li gorî xwe henek dikirin.

Bi alikariya henekan, gel hem nêrîna rast, şiroveyên bi mantiq tîne zîmên hem jî bando-ra şerê psîkolojîk tîk dibe. Dema ku gotinên kirêt, ji devê pêşkêşkarên telewîzyonên tirk dibihîze, di cih de, bersivê bi henekê dide. Mirovên ku li civatê ne, hem moralgeş dibin hem jî ka çima gotina spîker derew û bêbextiyê, hîn dibin.

Tevî hemû erjengiya şer, tevî hemû bêbextiyên û tevî hemû êrîşên hovane, şerê psîkolojîk ê dagirkeran, li Welêt rewş, wekî ku Seydayê Cegerxwîn gotiye ye:

"Xebat û kêf û şer e."

# Pisîk û goşt



ele Meşhûr rojekê diçe bajêr, sê kîlo goşt dikire û tîne malê. Pîreka Mele, ji bo ku bi hemle bûye, dilê wê pir dibije goşt. Ji ber vê yekê ew, goştê ku Mele aniye malê, tev dibijêre û dixwe. Evarê Mele tê malê, pîreka wî hinek pincarê hêşin çêdike û li ber Mele datîne. Mele dibêje:

– Çima te goşt çenekiriye?

Jina wî dibêje:

– Mela qet nepirse! Weleh ew goştê ku te anîbû, pisîkê tev de xwariye.

Mele ji wan gotinên jina xwe bawer nake û ji bo jina dibêje:

– Ka ji min re pisîkê bîne. Ez ê ji pisîkê sewal bikim, ka pisîkê goşt xwariye an na?

Jina Mele dibêje, qey Mele dîn bûye. Lê dîsa ji kêfa wê tê. Di ber xwe de dibêje: “Jixwe pisîk nikare bipeyive, goştê ku mele aniye, wê bikeve stûyê pisîkê.”

Jinik pisîkê digire û tîne hinda Mele. Mele dibêje:

– De tu ji min re mêzîne jî bîne. Jina Mele mêzîne jî tîne. Mele pisîkê dide ser mêzîne û diwe-

zinîne. Pisîk sê kîlo tê. Mele ji jina xwe re dibêje:

– Hurmet kanê pisîk?

Jina wî dibêje: “Ya mêro! Va ye te pisîk xistiye mêzîne.”

Mele dibêje: “Heger a li ser mêzîne pisîk be, lê kanê goşt?”

Jina wî lê vedigerîne: “Ya mêro! Vaye goşt di mêzîne de ye.”

Mele mesele fêhm dîke û di ser jina xwe de diqêre:

– Ku ya li ser mêzîne de goşt be, lê kanê pisîk?

SEYDO BAŞÇÎ-MEHDÎ

## Kurdo eşhedû...

Di dema raperîna Şêx Seîd de, leşkerekî artêşa tirk dîl dikeve destê serhildêran kurd. Li hemberî namlûyên çekên serhildêran, şaş dimîne, direhile û digirî. Ji bona ku wî nekujin, ji xwe re difikire û digihêje wê baweriye ku, kurd hez ji ola xwe dikin û ji bo misilmantiyê dilsoz in. Ji bo ku neyê kuştin, ji nişke ve hildipeke ser xwe û bi firêqetî dibêje:

– Kurdo, eşhedû la îlahe îlelah, valahî, eşhedû la îlahe îlelah kurdo, kurdo, kurdo.....

## Bûka mala ketiyan

Yekî Amedî diçe, ji hêla Qersê ji lawê xwe re qîzekê dixwaze. Le belê du qîzên malê hebûne. Yek xweşik û bedew bûye û yek jî nexweşik (eware) bûye. Bav û diya keçikê, qîza xwe ya nexweşik vedîşêrin û qîza xwe ya xweşik nişani zavê û dê û bavê wî didin. Lawik û malbata wî keçike dicebînin. Qelenê xwe didin, nişaniya xwe pê ve dikin û peyre jî bûka xwe tînin. Lê serê çavên bûkê girtî ne.

Dema zava xêliya bûkê radike, dibîne ku bûka ku wan xwastiye nîn e, diqêre, diçe cem diya xwe.

Diya wê bi axîn û keser dibêje:

– Lawê min îdare bike! Em carekê ketine. Heke em dengê xwe bikin wê em bêhtir bihetikin û xelkê bi me bikene.

## BI XELAT...

## XAÇEPIRSA BI XELAT (117)

## XAÇEPIRSA

|          |      |     |   |   |   |
|----------|------|-----|---|---|---|
| Şerh     | B    | A   | Ü | K | D |
| GİRSE    | ŞİR  | AV  |   |   |   |
| NETAR    | TUNA |     |   |   |   |
| ELE      | EK   | XUR |   |   |   |
| VENEHENİ |      |     |   |   |   |
| ŞEGAR    | NİN  |     |   |   |   |
| AVENAS   |      |     |   |   |   |
| AGİLNA   |      |     |   |   |   |
| ANDOKN   |      |     |   |   |   |
| OLİKAMO  |      |     |   |   |   |


### Bersiva Xaçepirsa 115'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 117'an kasetê Koma Rewşen 'Çiyayê Bêzar' e. -  
**Jêrenot:**

Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata hejmarê 115'an pirtûka M.Sayn a bi navê "Erkegi Öldürmek" qezenckirine: Mesut Nart(Mêrdin), Şükret Selçuk(İskenderün), Sidar Aydoğan(Amed), Fesih Çaruş(Izmir), Yeşin Ölmez (Mêrsin)

|                   |                   |                               |                  |            |                                |                      |       |
|-------------------|-------------------|-------------------------------|------------------|------------|--------------------------------|----------------------|-------|
| .....Bedîrxan     | Kelk, feyde       | Dawera kîkürtê                | 8                | Heb        | Tayên por                      | 6                    | İşgal |
| Navno, şerxwaz    | Rewşen            | Tîpa 5'an                     |                  | Eni, cephe | Dijberê germ                   |                      |       |
|                   |                   |                               | Bi feyde         |            |                                |                      |       |
|                   |                   |                               | Melevani, sopani |            |                                |                      |       |
| Qüçkirina gya     |                   | Ji bo                         |                  |            |                                | Tipek dengêr         |       |
| Cinavkek          |                   | Tipek dengêr                  |                  |            |                                | Bi kirdkî 'bi'       |       |
|                   |                   |                               |                  |            | Berepaşki "Heke" Serbilindî    |                      |       |
| Beşên ji rojê     |                   | Bir                           |                  |            |                                |                      |       |
| Komeke leşkerî    |                   | Berepaşki 'hanin'             |                  |            |                                | Daçekek Tipeke kurdi |       |
|                   |                   |                               |                  |            |                                |                      |       |
| Tîpa beri 'u'     | Koma ga û çelekan |                               | 3                |            | Lênêrina tûj Dengêra 'kat'     |                      | 10    |
| Adilane           | Seqet             |                               |                  |            |                                |                      |       |
|                   |                   |                               |                  |            | Tîpa yekemin Amûreke muzîkê    |                      |       |
| Zaravayek i kurdi |                   |                               |                  |            |                                |                      |       |
| Çiq               |                   |                               |                  |            | Berepaşki bi lez Dawera argonê |                      |       |
|                   |                   |                               |                  |            |                                |                      |       |
|                   |                   | Şex.... (Pêşengê ola ezîdîti) |                  |            |                                |                      |       |
|                   |                   |                               | 2                |            |                                |                      |       |



## WELAT

ROJNAMEYA HEFTEYÎ (Haftalık Gazete)

■ Li ser navê  
Gündem Basu ve  
Yayınçılık  
San. Tic. Ltd. Şti. (adına)  
Xwedî (Sahibi)

SELAHATTİN DELİ

■ Yönetim Yeri  
Çakırağa Mah. Sorguççu  
Sk. No:11/6  
Tel: (0212) 530 01 40

■ Büroya İrtibatê  
(İrtibat Bürosu)  
Ayhan İplik Sk. No:23/3  
Beyoğlu/İSTANBUL  
TEL: (0 212)  
251 79 37-251 90 13  
FAX: 251 95 85

■ Gerimendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

■ Berpirsê Kartê  
Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.

■ BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

■ NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilcilerimiz)

München:  
(Nünerê Çiftî yê Ewropayê)  
Mahmut Gergerli  
Tel: 49 871 672 29  
Fax: 49 871 670 815

■ Brüksel:  
Medeni Ferho  
32 532 721 12 83

■ Swîsre:  
İhsan Kurt  
Tel-fax  
41 21 652 76 07

■ Bonn:  
Ahmet Baraçılıç  
49 228 66 17 40

■ Hollanda:  
S. A. Fevzi  
31 104 85 55 43

■ Suriye:  
Jana Seyda  
Hefim Yüsiw

## Azadiya Welat û wezîfeya wendoxan

Goreyê nûstena Azadiya Welatê nê heftî (amorê 116), hetanî nika rojnameyê ma kurdan miyan de hetê amoriya tewrê vêşî Azadiya Welat pay de mendo. Verdê ney Welat û Welatê Me, goreyê zanayina min vardayinanê dewleta tirk ser, mecbûr mendê racenyayê (ameyê giroten). Goreyê dazanayina Azadiya Welatê nê hefteyî hetanî nika rojnameyê mawo tewr temenderg (uzun ömürlü) 115 amorî vejyawo.

La belê Azadiya Welat, no hefte alaqaqê wendoxan û xeftiyayanê rojnamey ser, resawo amorê xo yê 116'in. Qandê nînan ezo hemû xeftiyayan û ê kê rojnamey rê hetkarînan kenê, înan pêrin pîroz kena û ci rê xeftiyayanê nûwa tepiyay de serkewtin wazena.

Kes ke ewneno şaranê bînan, zîwanê înan de xeylê rojnamey û kovarî estê û iyê nînan wanenê û ci rê wayir vejyenê. Çi heyf o ke şarê mayê zey, ê şaran rojname û kovaranê xo rê wayir nêvejyenê û nêwanenê. 19'ê meng de şaxê HADEP'a Ūskûdari de seserîna rojnamegerîna kurdî ser panel estbi.

Nezdiyê 25 û 30 kesî bîbî tewrê panelî. Panelî peyra min Azadiya Welat girot xo dest û wast vîla kirî. Çi heyf o ke, 25 û 30 kesan miyan de ancax min şa jew rojname biroşî. Wexto ke min rojname kerdê derg, kesî vatê qayê oko min rojname kerdê derg, kurd niyo yan jî, min rojnameyê xerîban kerdê derg riyê xo açarnayê. Rastî a seat xulkê min winî

Çi heyf o ke, 25 û 30 kesan miyan de ancax min şa, jew rojname biroşî. Wexto ke min rojname kerdê derg, kesî vatê qayê oko min rojname kerdê derg, kurd niyo yan jî, min rojnameyê xerîban kerdê derg riyê xo açarnayê. Rastî a seat xulkê min winî bi teng ke, tayn mend rojnamî salda çarî rodî.

nî bi teng ke, tayn mend rojnamî salda çarî rodî.

La belê ez fikiryawa ke tewawo winayînan rast niyo, coka min vengê xo nêvet (nêkerd) û mi qerar da ke şima rê, enê niwisî binûsî. Çimki nê kerdenan peyra qîmetê şima mi het bi vêşêr.

Karo ke kewno mildê şima, şimayê anê ca. La belê ma wendoxê nêşenê zey şima karê xo biyarê ca. Ezo bawer kena wendoxê nê halî, zey bivînê û nûwa tepiya karê xo biyarê (anê) ca.

REMZÎ ÇETİNER

Her dem serê zîwanî de yeno vaten ke, bê çê beino dewlemend. Verê heme çî zîwan çiqas merdim bi jîyanê xo de sosyal bo, hend zîwanê ci beno hera û dewlemend. Sosyalizasyonê merdimî çiqas bibo zaf, hend mezgê ey de hêma (îmge) û fikir beno zêde. O çax mabeynê jîyanê sosyalî de, mezg û zîwanê merdimî de jew peywendî (îlişkî) esto. Rastî merdim xebata ke xo serî nûstusî de gava varazo, lazim o ke enê peywendî weş fam bikero û serê ey de zelal (yogunlaşma) bebo. Wexto ke eno nê-ara verî çêmanî xo, merdim yan jî nêvîkar lêkolînî xo de zaf xelet yeno.

Bi seseran ra nat zîwanê ma how binê destan de. Ma bi zîwanê xo waştên û hewceyî xo nêardo zîwan. Gava ma wazenê kurdî bifikirê gerek enî neyîmî mercî miyan ra wara de. En vatenî ma nê serî zîwanê ma de bêro famkerdînan ke nê dewlemend o. Eyro zîwanê ma de howtay(70) hezar çekû (kelîme) estê. Zaf tay neteweyî wayîrê enî dewlemendî yî. Ma heme zanî ke tewre dewlemendî peyamî Mezopotamya ra ma rê menda. Ma gerek xo ra persê, ma en (no) zîwan çiqas raver berdo. Coka nê persê ma vejyeno hunermendan ro, gama komcivîne înan yenê viraşten, persenî şima kurdî, la şima hunerê xo ebi tirkî virazenê. Zafê înan vanê ke, zîwanê ma yê entelektuel tirkî yo. Ū ebi eno remayenî barî xo limnenî. Zaf hunermendanî ma de tersî pirtûkî nêroşiyenê esto, bi mitalayî ê ser xo danê pey û remayînan barî. Karbidestê ma jî gerek înan

weş rexne bikirê.

Hunermendî û wêje weykerdenî yenî suruşî îne gel û gel ke jîyanî ci de derbasî keno ke a cografya wa. Heme neteweyan de enê hunermendî û wêje ana beno dewlemend. Seba hunermendî û wêje; yew rexney, yew merveten ya kêrîna bindestiya verî heme çî hunermendî wêje de yew estetîk haz esto. Gerek hunermendî û wêjeyan enî estetîkî weş bikirê.

Ewro gava tê cografya kurdî bi zîwanî tirkî binûsî û tem zaf nîno girotişî. Mîsal to helbesteke nûsnenî; eke serî evîna xo de evîna to kurd a, bi kurdî howeneno, to ra bi kurdî hewane, hownawenî germîni aye bi kurdî, doxî rî aye bi kurdî, porî veredayîni aye bi kurdî, hêvîyê aye bi kurdî, geredayenê aye bi kurdî bo, temî helbestî to bi kurdî binûsî yeno gêratîşî. Yan jî to yew derî yew vengî awe jew akordenê vilan, jew hamayîne weserî to bi zîwanî a cografya nenûsî û tem heyna nêdano.

Hunermendî û wêjenî ma serî ma û cografyê ma de benî wey. Madem to pey ma benî wey, ger bi zîwanî me tê meverazî. Seba zîwan qerîne netwano. Wexta ke zîwanê aye çênî bo, nêşikêna biqîro. Kes aya nêşinaveno û mekûmîyeyî teynanî bena.

Serî zîwanî de zafêren gerek hunermendî û wêjeyî karbidest bî. Wa yew enî xo weşo zîwanî merdimî evîne merdimî ya. Bi seran evîne xo teyna varda wa. Hadê ma eya zaf nêwindarne.

FAHİM KAYA

ÛLKEDE

# Ji Gündemê

## Manşetên qedexekirî

19 avrêl 1998 yekşem:

### ARTÊŞÊ BI PKK'Ê RE HEVDÎTIN PÊK ANÎ

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di programeke MED-TV de daxuyand ku, ew di 1997'an de li Ewropayê bi heye-teke leşkerî ya Tirkiyeyê re civiyane û hev-dîtin pêk anîne. Öcalan li ser pîrsekê wiha axivî: "Di bin serokatiya yekî di asta albay de hev-dîtin pêk hat. Wan diyar kir ku ji bo jinûvesazkirina di hundirê dewletê de, xebatên wan hene. Me jî got bê çiqasî rast e, emê bi hev re bibinin."

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan li ser Hêza Çekdar a Tirk û nixandînan çareserîya siyasî sekinî. Öcalan der heqê Sero-

ye, çeteya Açar e. Di berdewama axaftina xwe de Serokê PKK'ê wiha got: "Ez guman dikim ev derdorên ku têk çûne, lê qet hev û din bernadin, wê li ber xwe bidin. Dibe ku derbeyê jî pêk bînin. Ez dibêjim malbata Özal ji bo wê hat tasfiyekirin. Wê çi qasî bi ser bikevin? Wê di pêşerojê de diyar bibe."

20 avrêl 1998 duşem:

### JI SINN FEINÊ BIRYAREKE DÎROKÎ

Sinn Fein di kongreya xwe ya salane de diyar kir têkoşîna gelê kurd yek ji girîngtirîn pîrsgirêkên rojê wan e û got ku ew piştgiyariya ve têkoşîna dikin. Ev kongre di navbera rojên 18-19'ê avrêlê de li Dublinê pêk hat. Sinn Fein, wekî baskê politîkê

cure çalakîyê re amade ne."

### Yaşar Kaya: Dor hate ser kurdan

Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya got gelên ku têkoşîna rizgariyê didin, kurdan fêhm dikin û aştîya li Îrlandayê jî mirov kêfxweş dike. Kaya qerara ku hatiye standin ji bo çareserkirina pîrsgirêka kurd wekî piştgiyariyê girîng ifade kir û wiha axivî: "Ez guman dikim, dora çareseriyê tê kurdan."

21 avrêl 1998 sêşem:

### MIROVATÎ TÊ BINPÊKIRIN

Li navçeyên Antalya Serikê roja 10'ê avrêlê 7 û roja din jî li Manavgatê 3 bi temamî 10 gerîla hatibûn kuştin û îşkence û



saxî hatine girtin û dîv re hatine gulebaran-kirin. Kesên li morgê li cenazeyên gerilayan nêrin jî, gotin şûna guleyên di laşê gerilayan de, di heman rêzê de û simetrik bûn. Ev jî nişana înfazê ye. Dîsa hate îdiakirin ku gerilayên li Serikê hatine kuştin, Ûlkücüyan rê nedane ku li goristanê veşêrin. Li ser vê yekê rayedarên dewletê cenazeyên gerilayan bi bombebranan îmha kirine.

22 avrêl 1998 çarşem:

### BILA JI CENAZEYAN RE RÊZ BÊ GIRTIN

Rêxistinên girseyî ji bo cenazeyên gerilayan ku bi dozera hatin derxistin û veşartin û êrişên Ûlkücüyan faşîst reaksiyonên tîj nişan dan. Rêxistinên girseyî ev kirina dij-mirovayî şermezar kir û ji bo rêzgirtina ji cenazeyan re bangî dewletê û gelê kirin. Her wiha rêxistinên dan zanin ku ji bo kirinên bi vî rengî bihev re tewrgirtin pêwîst e. Serokê HADEP'ê Enqereyê Kemal Bülbül bûyer wekî fitkirineke şovenîst bi nav kir. Sekreterê Giştî yê İHD'ê Nazmi Gür bal kişand ser vî yekê ku kesên ji sîcên mirovatiyê re bédeng dibînin jî hevparê sîc in. Serokê Giştî yê ÇHD Aydın Erdoğan jî diyar kir ku, ev kirin ji aliyê hiqûqî ve jî sîc in.

Serokê Giştî yê Mazlum-Derê, Sekreterê KESK'ê yê Mafên Mirovan, Serokê Giştî yê SES'ê, Cigirê Serokê Giştî yê ÖDP'ê, Serokê Giştî yê Malên Gel (Halkevleri) û PSAKD jî kirinên li ser cenazeyên gerilayan û bêrezi şermezar kirin û reaksiyon nişan dan.

23 avrêl 1998 pêncşem:

### JI BO ROJNAMEVANAN BANGA YEKÎTIYÊ

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan mesajek şand pîrozbahîya 100 salîya rojnamegeriya kurdî ya ku li Kölnê pêk hat. Öcalan di mesaja xwe de diyar kir ku kurdan di warê rojnamegeriyê de çepêrên baş bi dest xistine. Öcalan got kevneşopî ku bi Yekîtiyê dest pê kirîye nayê biçûkîtin û pîrozbahîyên 100 salîyê jî ve yekê diselmînin. Öcalan diyar kir ku rojnamegeriya kurdî bûye dengê têkoşîna ji bo kurdan û got teşhîrkirina şerê psîkolojîk, ancax bi riya çapemeniyê pêkan e. Öcalan di mesaja xwe de wiha got: "Banga xebata pratîk a yekîtiyê, di yekîtiyê de berpirsiyariyê û xemên neteweyî dike, ez kesên berî niha bi 100 salî jî bo rojnamegeriya kurdî gav avêtine bi rêz û hurmet bi birînin."



kê duyemîn e Serkaniya Giştî Çevik Bir de jî ev agahiyên girîng dan: "Bi qasî ku min fêhm kirîye, navê Çevik Bir tiştêkî din e. Navê ew wî yê lêkirî (kod) bûye, navê wî yê rastîna hatiye veşartin. Çevik Bir diyardeyek e."

### NE PKK, ÇETEYA AĞAR TÊK ÇUYE

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan gotina Wezîrê Karên Hundirîn Mehmet Açar a bi rengê: "Di vî dema ku PKK tîk diçe de, kesên ji bo lihevhatinê ketine lêgerînê hene. Dewlet di bin kîjan navî de be bila bibe, bi PKK'ê re bazarê nake." wiha got: "Di vî dema ku Açar xwe dide der. Ez guman dikim wê tiştên qirêjî derkevin holê."

Her wiha Öcalan got a tîk diçe ne PKK

Artêşa Rizgariya Îrlandayê (IRA) ku ji bo Rizgariya gelê Îrlandayê tîdikose, tî nasîn. Sinn Feinê her wiha di van rojên dawî de bi înzekirina peymanê aştîyê ya bi hikûmeta inglîz re bal kişandibû ser xwe. Di kongreyê de ERNK û PKDW jî bi awayekî fermî hatin vexwendin û biryareke der heqê pîrsgirêka kurdan de jî bi piraniya rayan hate qebûl kirin. Di vî xalê de wiha hate gotin: "Partiya me têkoşîna gelê kurd a ji bo serxwebûnê bêsêrt û merc destek dike."

Ji nûnerên ERNK'ê Mizgîn Şen, qerara Sinn Feinê nixand û got: "Ev piştgiyariya ji bo gelê kurd di eynî wextî de ji bo dewleta tirk hişyarkirinek e. Ji bilî vî rayedarên Sinn Fein ên ku me bi wan re hev-dîtin pêk anîn jî gotin ku ew jî bo piştgiyariya gelê kurd ji her

kirinên dij-mirovayî li laşê wan hatibûn kirin. Medya û dewleta tirk vî kirinê bo handana şer bikar tînin. Malbatên gerîla İzzetin Doğan û Erdoğan Özdemir ku tî ididakirin di lihevixistinê de hatine kuştin, ji bo cenazeyên zarokên xwe bistînin hatin Manavgatê, lê cenazeyên zarokên wan nedan wan. Li aliyê din Ûlkücüyan bi xwepêşandanên xwe jî politîkaya şoven re kirin wekî pêlistok. Laşê gerilayan pêşî jî aliyê dewletê ve bi bêran hatin veşartin. Lê ji ber qebûlnekirina Ûlkücüyan faşîst, çend caran ji gorê hatin derxistin û ji nû ve bi hev re hatin veşartin. Serdozgerê Serik Yılmaz Can pîrsên der heqê mijarê de nebersivandin û got 'her tişt li gorî zagonan xwe tê meşandin.' Lê çavkaniyên xweçihî idia kirin ku 3 gerilayên ku li Manavgatê jiyana xwe jî dest dane, pêşî bi